

Di Stran-4 de, van stran û dûrik hene:

[Narê, Nayê, Nazliyê, Nofa, Nûrê, Qemerê Ciwanê, Qewil (1), Qewil (2), Qewil (3), Qulingo (1), Qulingo (2), Qulingo (3), Qurban, Osê Zarê, Oy Oy, Payîzok, Pemedo, Pismam, Ramûsan, Remzo, Saliho, Sêvê, Sincê, Sitiya Namô, Sitiya Ni'met Axa, Siwaro, Sînemê (1), Sînemê (2), Smaîlê Xelîl, Stran, Şerefo, Şerê Jîl, Şerê mala Nasir, Şerê Mehmûdê Emer Beg, Şênî, Şêx Neroz, Te d'binim, Way lo, Weso, Xerabo, Xewna min, Xezalê (1), Xezalê (2), Xezalê (3), Xezalê (4), Xezalê (5), Xezala Kurda û Teyar Axa, Zekiya, Yadê, Xidir, Xizêmê, Xurfanê, Zeynebê, Zeynel Beg, Zirav.]

Narê!

Navê Nara min Sarê,
Çavreşê ser bi şarê,
Xwedê ji Paşê nexweş bê,
Esker rakir ji Darê !,

Navê Nara min Fato,
Kimberzîvê ji Toqato,
Xwedê ji Paşê nexweş bê,
Esker rakir Bidlîso!

Navê Nara min Xorê,
Çavreşê, destmalsorê,
Xwedê ji Paşê nexweş bê,
Esker rakir ji Torê !

Navê Nara min Eminê,
Çavreşê, destmalşînê,
Xwedê ji Paşê nexweş bê,
Esker rakir ji Merdînê!..

Nayê

(Ha nayê!)

Ha Nayê ha, ha Nayê!,

Dû sozê xwe tu nayê,
Biçûk e porbelayê,
Serî j' zêra hilnayê,
Wez ban dikim tu nayê,
Bi t'er ketim belayê,
Ka sozê ko te dayê,
Ç'bkim j'malê dinyayê,
Qelena gewra m'nayê,
Kanî sozê te dayê?.

Havîn e l' nav rezayê,
Li bin sihka mêwayê,
Te dî bû mi dî bû,
Tu l' ser banî xeynê bû,
Tu b' derziya midyetî,
Tu b' qezik mendelî bû,
Tu b' teqîkî gulî bû,
Tu b' xeftankî şamî bû,
Dosta lawkê golê bû,
Tu b'xort' xelkê'r bengê bû.

Keçik sêva l' dikana,
Ketye destê nezana,
El'miye ramûsana,
Xera kirin b' dirana,
Keçik sêva li sûka,
Ketye destê biçûka,
Xira kirin b' nenûka.

Nazliyê!

Lê Nazliyê, Nazliyê!,
Çelengê, çelebiyê.
B' xort xelkê'r bengiyê,
M'j xwe'r l'çolê dîyê,
Lê Nazo, Nazliyê.

Rêka Herbê b' kizin e,
Destê Nazo b' bazin e,
Mêrê Nazo hakim e,
Nazo j' malek mezin e,
Lê Nazo, lê Nazliyê.

Dora Herbê b' bacan e,

Qirika Nazo b' mircan e,
Nazo j'eslê xwe' d Şeytan e,
Lê Nazo, lê Nazliyê.

Nazo, Nazlî j'çolê tê,
Lawik j'mala xalê tê,
Lê Nazo, lê Nazliyê,
Çelengê, çeleyê..

Nofa

(ji dûrikên li ber tembûrê)

Dêra Zorê yekban e,
Kirasê Nofa kitan e,
Memik tê re xya ne,
Yek deştê, yek zozan e.
Dêra Zorê bi dikan e,
Memkên Nofa fincan e,
L' serê sûk û dikana.
Dêka Nofa file ye,
Bavê wê misilman e.
Dêra Zorê mezin e,
Destê Nofa b'bazin e,
Par qîz bû, îsal jin e,
Hena l'ser dest û bazin e.
Dêra Zorê biçûk e,
Hena l'ser dest û nenûk e,
Lê, lê, lê, lê Nofanê.
Endîwerê paytext e,
Ka kevoka l'ser text e,
Kanî xortê di rext de
Ka soz û ka te bext e.
Nisêbînê giş jin in,
Keçên Stilî xweşik in,
Diyarbekrî ticar in,
Meskenê dost û yar in.
Memik behra xortan e,
Memik l'gewrê gihane,
Wek fincanê fexfûrî,
L'serê sûk û dikana.

Nûrê!

(Lê Nûrê!)

Lê Nûrê, lê, lê Nûrê!,
Ziravê, bêqisûrê,
Sê bisk j' têla tembûrê,
Dora te l' ser tenbûrê.

Bejna Nûrê ew l' takî,
Ba lê d' xîne j' hawakî,
Bejna Nûrê şiva ter e,
Ba lê d' xîne ji xeram û me re.

Ezê b' çaplê Nûrê bigrim,
Bibim j' nefsa canê xwe re,
Nav dewletên ecnebiyê,
Li ser bûye qal û şer e.

Lê Nûrê, lê, lê Nûrê,
Sê bisk j' têla tembûrê,
Sing û berê te gewr in,
Mîna berfa li Xeybûrê.

Lê kim dimsê Bizgûrê,
Ezê b' çaplê te bigrim,
Bavê sûka Bedlîsê,
Lê Nûrê, lê, lê Nûrê.

De wayê, Nûrê wayê,
L' te porsorê, porbeleyê,
Destûra te lawikî,
L' ser cotê memka didayê.
Tama memkê Nûrê xweş in,
Pirtikala li Rihayê,
Wek şekirê l' dor Besrayê,
Dê wayê, Nûrê wayê.

Lê Nûrê te kir, te kir,
Sê biskê sor hine kir,
Te miradê dilê xwe kir.

Nûrê dî bû l' Gasinê,
Kiras-sor e wek xwînê,

Mihbeta dila difirînê.

Lê Nûrê, te kir, te kir,
Te miradê dilê xwe kir,
Te sing û ber j' mir venekir,
T' a min bû Xwedê ne kir.

Nûrê dî, banî, banê,
Tu b' kofî û bi k'tanê,
Tu b' şar û b' kesrewanê.

Tu b' xeftana şamî,
Mihbeta dila şêrîn e,
Tu xeşîm î, tu nezan î.

Te derî bişkoşka min vekir,
Te l' memkê min temaşa kir,
Min di fincana de hûr dikir,
Mîna bû dims û şekir.

Min b' ser devê mezina da kir,
Nava min hênik ne kir,
Te tişteke başir ne kir.

Qemerê Ciwanê!

Qemerê ciwanê !, çi şev şev e?
e'wra li ezmana teqe-req e,
Birûskê lêda, kir meşreq e,
Balê Memkê di kulmalê,
û kulmal babê wê dibîne,
fincana di ferfûrîne dor bi deq e,
Dê bimeş, bimeş, Qemerê bimeş,
Piştî emrê Sultan Ebdil-Reşad li dinyayê bimeş..
Qemerê ciwanê !
Qemerê ciwanê !, çûme Cezîra Bota, dikana pêşiyê,
Ezê şalekî ji Qemera malê re kirrim (bikirim), dor bi rîşiyê,
Ezê digel Qemera malê bigerim,
çerx û felekê, di dinyayê bi derwîşiyê.
Dê bimeş, Qemerê bimeş,
Piştî emrê Sultan Ebdil-Reşad li dinyayê bimeş.

Qewil (1)

Çûm Bexdayê çar derî ne,
Her çar derî qubletî ne,
Mi dî sê siwar ji Bexdayê bi derketîne.
Eslê wan siwara dipirsî ye,
Ev her sê siwar ji ocaxê Bûbê Gurî ne.
Serê simê wan siwara li erşê Xwedê ne,
Kunrimê wan siwara li rûkê erdê ne,
Zengûyê di wan siwara safî ji birqê ne,
Ev her sê siwar siwarê di mala Bûbê ne,
Siwarê pêşî Bûbê Gurî ye,
Siwarê navê Sîn û Seydoş e,
Siwarê diwayê Bûbê Lawên e.

Qewil (2)

Roja vê qal û belayê,
Cehenem e digire sewdayê,
Bav gazî dike law nayê,
Law gazî dike bav nayê,
Roja heşrê, rojek teng e,
erd û ezman li me dide denge,
Me gunehkara nedima renge,
Hêvî Mihemed Mistefa ye.
Ez l' bextê te me l' qiyametê,
Tu ê l' me bikî vê şefae'tê,
Ji fedla Xwedê re, tu ê me bavê cenetê,
Îmdad Mihemed Mistefa...

Qewil (3)

Wey me çi kir û me çi bi derda,
Zêrê zer bû, me bi sifrê wer da,
Me dinya girt û axiret bi der da,
Xwelî l'serê me û kewna dinyayê,
Tirba min î nav tirban e,
Dilopek hatî li ser çava ne,
Hemû j' gunehê dê û bavan e,
Tirba min î, li ber deviyê,
Dilopek hatî li ser eniyê,

Hemî j' gunehê cîraniyê,
Xulî l'serê me û kewna dinyayê,
Tirba min î, teng î dirêj e,
Têde heye markî kher û gêj e,
Dixu goştê îsanê bê nimêj e,
Tirba min î l'ber dîwara,
Mi dî mişka ban kir mara,
Heydê emê herin goştê îsanê rojîxwara,
Xwelî l'serê me û kewna dinyayê,
Kanî Adem, ka Hewayê,
Kanî Mihemed bavê Fatmayê,
Daîm selawata bidin navê Mihemed Mistefayê.

Qulingo (1)

Me te dî bû li ber dolabê,
Baqa fetîl li ser kabê,
Awir (1) didimê (2), ket ranabê,
Canê me (3) h'eland weke şîşê kebabê.

Hatî qulingê serê çiyê,
Danî li deştê xal û bîyê,
Terkê bejna zirav nadim,
hetta şei'r girêde ser kofiyê.

Me te dî bû li kullakê,
Bejnê zirave, kerîk (4) ordekê,
Xwezî bi gava em rûniştin tevda,
me dizî sê roş (5) ji felekê.

Hatî quling ê va serheda,
Ketme destê nisûbeta,
Sê roj (6) mame ber qubleta (7)..

Me te dî bû ser kehniyê (8),
Zêr beriqî li eniyê,
Ez meiyam, çûm pêiyê..
Me delal (9) dî bû, me nas ne kir,
Ji gundî û ji malî (10) me pirs ne kir,
Teresbavê me ramîsan ne kir..
Derê malê me û piştê mala me bi teéwa, (11)
Lê danî bû (12) cohtê kewa,
yariyê min û teresbavê bi derewa..

.....
Têbîniyên sosin û prym:

(1)awar (2) didmê (3) te canê (4) kerîka (5) roj (6) ro (7) bi qubleta
(8) Kaniyê (9) Me xelqê delal (10) me gundî (11) tava ... (12) danî.

Qulingo (2)

Ev parçeyê h'eyranokê ji devzara Nûriddîn Saîdê, ku xelkê Zaxo ye, hatiye bihîstin û belvakirin.

Qulingo qulingê Sîrtê,
Eve sê şevan û sê rojane, mîrata rê tê..
Çawa sebrê delalê min, li welatê xerîbiya tê ?!

Herê qulingo tu xeletî,
Berê te li zozana , piştê te li milletî,
Heçî kesê li zozanê jorî hat û..
Wa li min evdala Xwedê bê xefletî..

Qulingo tu ne koçerî, tu neêsîrî,
Xûsara (xûya sar) malik xirab li ser çengê te qerisî..
Heçî keskê ji zozanê jorî,
Hat û min evdala Xwedê jê pirsî..

Îvarî ye..roj çî nema,
Bosîye teka mêra li derê xanîkê,
Mala babê min girtî gozel, û çema min gotê..?!

Qulingo (3)

(Kulingo)

Lo wey lo...
Qulingo, tu qulingê deşta vê Yemenê,
Tu çima ji qewm û refê xwe veqetiyayî?
Tu mayî wiha bi tenê,
Te hêlîna xwe çê kiriye li zozanê Şerefdînê,
Li deşta Hezargolê (îro Bîngol e),
Li ser koşka bavê Siyabendê,
Li ser sûra vê bedenê,
Keçik ban (bang) fikirê lawiko!
Mala bavê şewitiyo!
Şevkê ji nîvbenda şevan û pê ve,
Were tewafa sing û berê minê kalî, gewrî, bozî,
beyazî û deqandî..
Bila hêdî hêdî li ser te bê xûydana ber vî canî..

Lo wey lo...

Qulingo, tu kulingê deşta vê Mûşê,
Xwedê hebîne, çima tu ji qewm û refê xwe veqetiyayî?
Te hêlîna xwe çêkiriye li zozana Şerefxanê,
Li deşta Hezargolê, li ser tayê wê kalûşê..
Sala par vî çaxî,
Keleşgewra min ê ji qîzan qîzek bû,
di mala ba xwe da bû..
Sala vê salê, ez xiyala xwe didimê,
Sor sê biskê xwe yê narincî,
berdane ser darê mîrata vê dergûşê..

Lo wey lo...

Kulingo, tu kulingê deşta Wanê,
Xwedê hebîne, çima tu ji qewm û refê xwe veqetiyayî?
Tu mayî bi tenê,
Te hêlîna xwe çêkiriye li zozanê Şerefdînê,
Li deşta Hezargolê, li welatê Kurdistanê,
Li ser milê mîrata wê dîkanê..
Keçikê ban (bang) dikirê, digo:
Lo, lo lawiko!
Kula Şam û Helebê di mala bavê keto!
Şevkê ji nîvbenda şevan û pêve,
were devê xwe bavê,
boxaza qirika min î kalî, gewrî, bozî,
beyazî û deqandî..
Bîstikekê devê xwe têxe bin mîrata vê kitanê...

(* Ji rojnameya Roja Nû (1943-1946), Beyrût- Lubnan.

Qurban

Yadê qurban!...

Serê sibehê, ne tî me û ne birçî me,
Mal mîrato, li ser kanîka Eyin Sincê rûniştî me,
Xelkê aşiqê malê dinê,
Ez bi tenê aşiqê keçka fille Mêrdînî me,
Ha wer delal!...
Ev çem ji çemên Biêriyê,
Kelekvana kelek berda pê gemiyê,
Ciwaziyê xweş e, ji biçûkiyê,
Belê were tewafa sing û berê, memikê Bisêriyê...

Yadê qurban!
Serê sibê, kew im û kewê reşim,
Li serê xaniyê mala bavê te dimeşim,
Wez aşiqê bejna zirav û çavêreşim,
Belê, Gewrê! serê sibehê kewim û kewê nêrim,
Li ser xaniyê mala bavê te diçêrim,
Wez aşiqê bejna zirav, çavê zerim,
Destmal sorî, pêşmal şînî, gul bi gulî,
Keleş Gewrê, ez koçerim, narim deştê,
Wez xencera zîv û zêrî nadim piştê..
Belê keleş Gewrê!
Sê cara lêxistî bû li teniştê.

Şerê Osê Zarî

(Ji berhevoka **Albert Socin** û **Eugen Prym**-Petersburg 1878)

Carek ji cara, car zemana
Axa dadiya, mîro dadiya
Mîrz Axa koçerî li Mêrgewarê Çoxarê rûnişte
Sê biraziyê wî hene, yek Osê Zarî ye
Edlayê keçê wî ye
Xanê Bedlîsê qasidek çandiyê
Ji boyî xwezgîniyê
Mîrz Axa nedayiyê
Xanê Bedlîsê esker çêkiriye
Mîrz Axa ji Mêrgewarê Çoxarê bi deraniyê
Bi zozana reviyê.
Şivanê Mîrz Axa û şivanê koçera şer kiriye
Serê şivanê Mîrz Axa çikandin dane giriye
Hatîn konê Mîrz Axa, gotin sere me şikandiyê
Dibêjin herin Mêrgewarê Çoxarê, we çi belê xwe avêtiye?
Mîrz Axa dey (*deng*) ne kiriye
Osê Zarê rabû piyê
Sihê kona hilaniyê
Li Mêrgewarê Çoxarê çadira daniyê
Xanê Bedlîsê bihîst dey ne kiriye

Xanê Bedlîsê rabû piye
Eskerê qewî li mala xwe civandiye
Savarê Mîrz Axa kelandiye
Gazî li Evdî xulam kiriye
Evdî xulam şandiye
Go here wî teresî rake bi tilingiye
Heke ranabe bi tilingiye
Jê re bide bi erzî ye
Emê bînin eskerê wa Romiya
Nav me û wî nine bêbextiye
Evdî xulam suwar bû meşiye
Evdî xulam çûyî ye
Li Mêrgewarê peya bûye
Mîrz Axa diye
Go: Axa ji vir rabin bi tilingiye
Heke tu ranabê, emê ji te re bidin bi erzî ye
Nav me û wa nine bêbextiye
Osê Zarî hatiye
Şeqamek lê dayî ye
Şalpêne sto jê aniye
Evdî xulam bi erdê kişiyê (*ketiye*)
Sê diran ji diranê Evdî şikandiye
Go: de here, dem (*de em*) binêrin
Zorê we terezê bajarî çiyê?!
Evdî xulam e, rabû piya
Erê bi baskê mal vegeriye
Dîwanê Xanê Bedlîsa (*Bedlîsiya*) tijî ye
Çû destê Xanê Bedlîsê û vekîşiyê
Go: Kanî? Te Mîrz Axa bi xwe re aniye?
Go: yeke bêdeng Osê Zarî ye
Ewî şeqamek li me xistiye
Sê diran ji diranê me şikandiye
Ji me re got, go: Here, dem (*de em*) binêrin

Zorê we terezê bajarî çiyê
Xanê Bedlîsê gotiye
Go: Bavêjin hebs û zindaniye
Te reşwet û bertîl ji wa xwariye
Ay li min û li vê heyatê
Gazî bikin Birahîmê xulam bire bê hêzûratê
Ji me re bibê vê kaxetê
Birahîm xulam rabû piya
Kaxetê di paşilê xwe daniye
Piserê (*bi ser rê*) Mergewarê çûye
Li konê Mîrz Axa peya bûye
Mîrz Axa kanih' (*qanii'*) kir, aniye
Ay li odekê Xanê Bedlîsê rûniştiye
Osê Zarî bi razikî wî ye (*li hember wî ye*)
Ewî du roja ma, êmê wî ne hatiye
Ew suwar bû serê (*ser rê*) ketiye
Bi baskê bajar hatiye
Ay li bajêr peya bûye
Hespê xwe bi xanê şandiye
Telbê odê kiriye
Ramên ji odê pi (*bi*) ser hatiye
Ode ji zilama tijî ye
Li nav şekala rûniştiye
Kesik nizanê kî ye
Amê wî li kurcîkê rûniştiye
Lê nizanê Osê hatiye
Evdî xulam hatiye
Qehwek E'demî çêkiriye
Ewî bi dîwanê meşiye
Fincan di dest Mîrz Axa î koçerî ye
Wekî fincan vexwariye
Xulam, narîn belişîne bi xencera
Mîrz Axa kuştin bi bextiye

Ewê şeva reşa tariye

Osê Zarî rabû piya

Ewî derî girtiye

Derî li me'qûdî kilîd kiriye

Bi dîwanê hicûm kiriye

Bîst û heft bajarî li dîwanştiye

Revî ji xwe reviyê

Ê~birîndar temam kiriye

Osê Zarî rabû piya

Gazî li xencî (*xizmetkarê odê*) kiriye

Xencî manegî (*mehîn*) jê re aniye

Emê xwe ser dama manegî şidandiye

Destê xwe avêt rikêbê suwar bûye

Kete nav sûk û çarçiye

Xwe bi dergahê giheştiye

Dergevan hat pêşî ye

Rahişte gamê meînê, go behbişa (*bexşîşa*) xwe xwastiye

Go me behbişa te navê, te Xanê Bedlîsê kuştiye

Ez hatim (*hatme*) heyfê wî ye

Rahişte şûr kişandiye

Yek li dergevan xistiye

Serê dergevan firandiye

Zengo li menagî hejandiye

Ji bajêr û derve bi derketiye (*derketiye*)

Heft şergah û kemîn ji bajar û derve li ber daniye

Şeş şergeha û kemîn dayî ne kiriye

Şergah û kemînê paşî tifino berdayiye

Yek derhanê Osê ê çep ketiye

Osê ji hespê ketiye

Bêraqdar hêriş kişnadiye

Bi ser Osê hicûm kiriye

Ji dûr da coht (*cot*) demance bi ser daniye

Tiştik bi Osê ne kiriye

Bêraqdan (*Bêraqdar*) ne nêzîk e, jê dûr e, pêş ve hatiye

Li baskê Osê qedimiye

Herdu ketin (*ketne*) şerê şûr e

Dilê min dadiye

Osê şûrik li Bêraqdar xistiye

Serê bêraqdar firandiye

Bêraq ji bêraqdan (*bêraqdar*) standiye

Bi bêraqê xwe girtiye

Lingê sax kir rikêbê, suwar bûye

Di dûv şergah û kemînê ajotiye

Şergah û kemînê ji ber reviyê

Ew e Osê bi baskê mal vegeriye

Liqayê hewarê koçera bûye

Amê xwe teslîmê wa kiriye

Di dû Amê wê bi mal biriye

û hawarê bi xwe ra aniye

Di dûv şergah û kemînê ajotiye

Sêh zilam dî kuştiye

Duwazdeh çeke j iwa aniye

Derbik li Osê ketiye

Lê ne go (*ne got*) derbik li min ketiye, go: eybaniye (*şerm e*)

Ewe Osê bi baskê mal vegeriye

Hawarê xwe bi xwe ra aniye

Bi baskê mal hatiye

Li mal dane huzn û giriye

Dibêjin; Elhemdillah Osê vegeriye

Mîrz Axa jê re bi goriye

Osê Zarî Li nav ciya razayî ye (*Li nav ciya hatiye dubare kirin*)

Erê ji koçera (*re*) ne gotiye

Derbik li min ketiye

Birînê Osê xera (*xerab*) bûye

Qîrên bi Osê ketiye

Gotin: H'ale h'ewalê te çiye?

Go: Binêrin çi li vir ketiye?

Lê nêrîn, go: Derbik li rehnê wî ketiye

Hakimo ji Luqmayê

Dermên bînin ji Bexdayê

Kitan bînin ji Besrayê

Hakim hat li birînê Osê nêrî,

Zanê wê bimrê, go: dermanê min lê nayê

De hûnê xweş bin, ew jî çû wê dinyayê

Êlê koçera bê Mîrz Axa û bê Osê bi kêr nayê.

Oy Oy!

Emê henê çêkin,
Emê henê di teştê kin,
Oy, oy, oy, oy.

Emê li biskê bûkê kin,
Li sinbêlê zavê kin,
Oy, oy, oy, oy.

Zavê çûye sûkê,
T' anî hena bûkê,
Oy, oy, oy, oy.

Zavê çû hemamê,
Dixwîne Quranê,
Ji bona îmanê,
Oy, oy, oy, oy.

Payîzok (*)

(*Ev parçeya nivîsê ji tîpên erebî hatiye guhartin*)

Nivîserê payîzokan: **Ebdilrehman Mizûrî** ye

Seyda Ebdilrehman Mizûrî yê, ku hozanvanekî Navdar e di sergotina vê payîzokê de dinivîse:

“Naveroka [Payîzok]a evîni û berdilkî ye, di navbera kiç û kuran da.. yan kûrnêrîna dunyayê ye, bi awayekê felsefî, demê belgwerandina dar û barî.

Rohilatvanê mezin **TOMAS BOIS** nivêsiye:

Payîzok, an ku stranêd payîzê, bendêd wê kur û kiç dihavêne ber êk, demê payîzê ji zozanêd bilind têne xarey.

Bo piştevaniya axiftina borî, çend rêzek di nav payîzokêd gotara me da hene, basî hatina koçera diket ji zozana weku:

Iro payîze

Minê nekiriye kar û barê zivistanê

Koçerêd malxirab, malêd xwe barkirine

Ji war û kozêd vê zozanê...

...h.d.

yan:

Nîşanêd pyîzê çine ..?!

Sêvêd sorin

Gelî û bergeliya bigrin;

Da koçerê malxirab neborin

...h.d.

Bo kês û qafiya [Payîzoka] ço cudahî di navbera wan û stranêd dî yêd kurdî da nîne, wekî [Lawika] yan [Heyranoka] bo nimûne.

Her hozanêd serbestin..di her benrekê da bara pitir [sê] qafiye yek digrin..carna [çar] qafiye jî.

Evêd jêrî, qefteka payîzokêd kurdîne, li dû zanîna me, heta niho, nehatîne belavkirin:

1) Hayê..hayê

Wê li min hatî pîre payîzekî, bi lez û beze..

Serkêd jorî befrê girtin,

Xezebê xwe havêt xopanêd, kevne reze..

Xwezî ji xêra Xwedê ra,

Tu bûkeka mala babê min bayî,

Min ji kirt û malê dinê eve bese.. !

2) Hayê..hayê

Wê li min hatî payîzekî reş û tarî,

Dara xemla xwe werandin,

Tavî tavî baran barî,

Xwezî ji xêra Xwedê ra,

Ez û bejna bilind careka dî bigehayn êk,

Bila paşî eza rebena Xwedê bibam temaşakê vî bajarî..

3) Hayê..hayê

Wê li min hatî payîzeka zûye,

Minê nekiriye kar û barê vê Kanûnê,

Serkêd bilind befrê girtin,

Taviya xwe havête kepiyêd dêrebûnê,

Kur û kol malo, mal babxirabo !
Deybabêd te çima denekir,
Wê sala par, li wargehêd wê havînê..?!
Iro payîze wa hatiye wextê, xatirxwastin û bela vebûnê..

4) Hayê..hayê

Iro payîze, dilkê minê ketiye ber kesera,
Gure bakî rabiye li (Katol) û (Kelempêrê)..
Firandiye dexl û qirikê li ser bêdera,
Heçyê dost û yarek bi keyfa dilê xwe nebît,
Bila çomara medhêd xwe neket, li nav dîwana, li ço dera..

5) Hayê..hayê

Iro payîze, minê nekiriye kar û barê zivistanê,
Koçerêd malxirab, malêd xwe barkirine,
ji war û kozêd vê zozanê
Xwezîka ez bibame heval û hogirê bejna bilind,
Di sê şevêd Kanûnê da û di sê rojêd xopana vê golanê..
Daykê tu bi Xwedê kî serê min rebena Xwedê bio,
Sê biskêd delal çêkî wekî kiçêd şêxa û dena demê payîzê,
Diçne [Cemayê] tewafa [Şêxadî],
Minê ebdaleka Xwedê digel firîkî..

6) Hayê.. hayê

Payîzekê li min dest da minê nekirî kar û barê zivistanê,
Serê berûka me dixazê reşêşekî hûr baranê,
Îro xelk û a'lem bi h'alê xwe zewicîn,
Ez û hevala xwe biye mehelê dest ji hevdu berdanê..
Nîşanêd payîzê çine? Sêvêd sorin,
Gelî û bergeliya bigrin, da koçerê malxirab neborin,
Evîniyeka malxirab û dunya û a'lemê bi sal û mehane,
Evîniyeka min û keleş gewra min bi kotek û zorin..

7) Hayê..hayê

Payîzekê li min dest da,
Min çî ji h'alê xwe nezani,
Serê Somrîtkê me girtî befrê, cemedê girtî mêrg û kanî,
Çavê keleş gewra min bi xwe reşin, nagirin kilê Subhanê..

8) Ax hey hayê..hayê

Li min hato pîre payîze,
Weyla li min ebdalekê Xwedê,
Min nekiriye kar û barê zivistanê,
Çiyayêd me yêd jorî befrê yêd girtîn,

Li deşteka me ya têtin taveka baranê,
Hesen berê xwe dayê bo wextê kepir hervandinê,
Kîçan û kuran dest ji êk berdanê,
Ay hoy felek xayînê, sîng û berê vê kulê, kul malbabê,
Koz û pêwanê destê min bûn,
Vêcar dila berê xwe bidê, ketiye benda malan û mêran,
leqan û gezan û heramê têkvedanê..

9) Ax hey hayê..hayê

Bi ser me da hatiye pîre payîzeka çenda bi lez û beza,
Taveka baranê darête ((dibarête)) deşta me ya jêrî,
xirpakirin keprokêd evan reza,
Ay hoy felek xayînê, sîng û berê vê kulê, kul malbabê,
Koz û pêwanê destê min bûn,
Vêcar dila berê xwe bidê,
Çawa ketiye ber benda malan û mêran, leqan û geza..

10) Ax hey hayê..hayê

Bi ser me da hat û pîre payîze, wa li min diketin gazî,
Taveka baranê darête (dibarête) dar û barê rengîn,
Şenga spîndarokêd hewda, hêlane tazî,
Kîçê malbab xirabê, tu çawa ji Xwedê natirsî,
Eve destekê helal û beybûna ji min dixazî?..

11) Ax hey hayê..hayê

Gelavêja malxirab tu çenda sarî,
Ez dizanim, daxeka te ji erdê bû, ya dî ji belgêd dar û barî,
Pa tu bo min çi dibêjî, sîng û berê vê kulê, kul malbabê,
Koz û peywanê destê min bûn, evroke êkê dî xarî..

12) Ax hey hayê..hayê

Bi ser me da hateve pîre payîze, wextê evan gêra,
Gelavêja malxirab xwe dihelavêt nav qeşanekê stêra,
Sîng û berê vê kulê, kul malbabê,
Koz û peywanê destê min bûn,
Dîsa ketîne ber leqan û gezan, ber benda malan û mêra..

(*) Jêdera Payîzokan: binêr Kovara **Beyan** 120/1986

(1-6) ji zardevê **Hecî Emerê Bêzehî** hatiye wergirtin.

(7-9) ji zardevê **Muhemmed Arifê Cizîrî** natine wergirtin.

(10-12) ji zardevê **Muhemmedê Nîhariyê** (M. Yasînê Bamernî) hatine wergirtin û ji aliyê hozanvan **Muhsên Qoçan** ve hatine nivîsandinê.

Pemedo !

Pemedo ne yê bihare, ne yê pehîze,

Pemedê şeng ji mala Sila, ji xalan zîze,
Malê xwe bar kirî, deynandî binê çiyayê Ebdilezîz e,
Xeleyê, mîrê Gêsan kir dîwane,
Digazît ket cindiyan û yekane,
Herçî terş û talanê xeretê ((xeberê!)) Pemedê şeng bo min bînit,
Ezê bidimê keçikekê navê wê Qeremircane,
Ez Qeremircan im, Qeremircanim,
Xudan û xwîşkê heft biranim,
Digerim li koçik û li eywanim,
Herçî terş û xeretê Pemedê şeng ji min re bînit,
De bila destê min bigirit,
bigerînit hemî axêd Kurdistanê..

Malekê ji malan pê de,
Kurkekî bîj e, heya tê de,
Dibêjit: Ez dê terş û talanê Pemedê şeng dê bînim,
sê rewê dewarê zêde,
Dilê min pehûke, dilê min pehûke,
Li seran têne befre, li geliyan têne pelepûke,
Gavan û şivanê Pemedê şeng li ber xwînan vebûne bûke,
Dilê min pexal e, dilê min pexal e,
Dibêjit Pemedo rabe,
terş û talanê te birin, bi carekê,
Ez Pemedê şengim çavbelekim,
Xudanê Leylika gerden pehnordekim,
Ne bêjin ev yekin, em gelekî,
Dibêjit: Pemedo! wene, wene,
Emê sêsed û pêncî mîrê Gêsiyan hene,
Hemî avêtin ber bextê Leylika te ne,
Mêra ji mêra hêvî hene,
Sê mêra namûsa te ne,
Mi nizanî bû, terş û talanê te ne..

Pismam

Pismam çû bû sûkê,
Gewrê li te dotmamê,
Anî henê bo bûkê.

Henê di testê kin,
Ka bînin avê lê kin,
Li simbilê zavê kin,
Û li biskê bûkê bûkê kin,
Û li serê xeswê kin.

Zavayî bê hala,
Zavê li darbesta kin,
Ber b' cbana de rast kin.

Bûkê li hespê kin,
Hevsêr di mistê kin,
Bûkê b' rizqê zavê kin.

Ezê yekê bînim,
Navê wê Emînê,
Hestiya dihelînê.

Zava çû hemamê,
L' min gewrê, l' te dotmamê,
Dixwîne Quranê,
Ji bona îmanê.

Ramûsan

Mi dî bû, te dî bû,
Nav pembûa,
W'ez ramîsim, Her du rûya.

Mi dî bû, te dî bû,
Nav Tûtînê,
Piling deyne ser qelûnê,
Te ramîsim,
Te xatûnê.

Mi dî bû, te dî bû,
Nav geneka,
W'ez ramîsim,
Bi heneka.

Remzo!

Rêka Midyatê teng e,
Paçê Remzo heftreng e,
Ramîsanek bide min,
Êvar e l' min dereng e.

Qamişlokê b' bacan e,
Heçî Remzo nas nake,
Tolê qîza qumandar e.

Qamişlokê b' bacan e,
Qirka Remzo b' mircan e,
Heçî Remzo nas nake,
Remzo dosta serjan e.

Dêra Zorê mezin e,
Par qîz bû îsal jin e,
Heçî Remzo nas nake,
Tolê, qîza hakim e.

Dêra Zorê biçûk e,
Par qîz bû îsla bûk e,
Dêra Zorê paytext e,
Fincana qehwê li dest e.

Saliho

Şêxê kûr

Saliho pismamo lo !
Ezê bi Diyarbekira şewitî ketim li têtê xim,
Ezê têtê li têtê bikişînim,
Ezê bişînim Enqera xopan, belkî efwa pismamê xwe bînim,
De rabe lo, dilê min di dinyê de tune ye,
De rabe pismamo lo..
Girtiyê hefsawa lo, û şeniqandin,
Li qoça Diyarbekira şewitî li korta girtiya,
 bin dara çinarê, bi destê neyara lo..
Xudan xêrek di bajarê Diyarbekirê de tune,
 ku bi destê pismamê min bigre,
 ji hefsxana xwîniya derxe..

Salih digo: Dotmanê de rabe,
Ji devê hefsxana Diyarbekir, rabe e'ybe,
Çunkî min digo: Tu ji malek qenci, gava xelkê bê:
"Pismamê te şeniqandin,
Li qoça Diyarbekirê xelkê bê qehbeta pismamê te çiyê.."
Kurê dotmamê !
Tu dibê qehbeta pismamê min tune,
Sê qehbeta pismamê te sebêba Kurdistanê, mada Şêx Seîde..
Îşallah dotmamê li wê dinyê gelekî ji mi re xêr û sewabe,

Diyarbakira şewitî bişewite, di kortê de,
Walî û Elî Saîb, reîsê îstîqlalê pê re..
De rabe pismamo, lo ..
De rabe girtiyê hefsawa lo..
Sed û yek salek îdam dawa daliqandin,
li Diyarbakir destê dijminawa lo...

Sêvê!

Ax lê Sêvê û ax lê Sêvê!,
Deqek şînê, l'serê lêvê,
Sêv qubar e, b'min naxêvê,
Ax lê Sêvê, û ax lê Sêvê!.

M' Sêvê dî bû l'ber avê,
Singê gewir da bû tavê,
Ezê bi çeplê te bigirim,
Bavê m' qeza Eyintabê.

Rêşya şa'rê daket navê,
Bihar hatê dar bişkêvê,
Payîz hatî wextê keyfê,
Havîn hatî dilaxêvê.

M' sêva xwe dî l' ber dîwarê,
Wê da bû cotê guhêrê,
Ezê bi çeplê te bigirim,
Te bavê m' welatê jêrê.
Tama memikê te xweş e,
Mîna şekirê bajêr e.

Mi' Sêva xwe dî l'ser xaniya,
Tena, tena dimeşiya,
Min dest avêt cotê gulya,
Bi ser min de hatiya,
Wek kevanê Bûçiya,
Ez ketim dilim êşiya,
Kul ket mala gundiya,
Ji xelaf xort û naşiya..

Sincê!

M' Sincê dî li ber berana,

Ez xulam dev û dirana,
Heb lûlê li nav mircana,
Lê nema lê Sincê,
Diran hebê birincê,
Gulî gihane kolincê.

M' Sincê dî bû li ser xênê,
Eqlê xorta difirênê,
Lê neman lê Sincê,
Gulî gihane kolincê,
Ramûsanê te xweş bûn,
Ser kehnika Eyinsincê,
Lê neman lê Sincê.

M' Sincê dî bû li nav rezan,
Tu binêr li qolan û qezan,
Ez çûm rûke sor bi gezan,
Lê neman lê Sincê,
Ezê Sincê birevînim,
Bibim welatê Çerkesan.

Sitiya Namô

Sebriyê Serhedî

Oyo, yoyo, Mûsa Xaîno....
Sitiya Namô digot:
Mûsa Xaîno, bext ne wiha ye,
Bext ne wiha ye,
Ne bi zirta ye û ne bi forta ye,
Ne bi gera ser xaniya ye,
Ne bi debance qerebelo,
Te li teniştê rastê girêdayî ye,
Ne bi qayîşê rexta çep û rasto te girêdayî..
Mûsa Xaîn bextê dinyayê ne wiha ye,
Mi go: Qey tu bi mêraniyê,
Mîna Mihemed begî, lawê Cemîl paşa yî,
Li hinda Pira Reş, bajarê Diyarbêkrê,
Pêşiya trombêlê zabita rê girêdayê..
Mi go: Qey tu bi i'lmê xwe,
Mîna lawê Mela Fethulayê,
Mi go: Qey tu bi ciwanmêriyê,
Mîna Muchim şêxê E'rebayê...
Şevê nivê şeva Huseynê Gurî,
Serwanê deva tîfingek şalixî,

Di ser terşê xwe re berdayî,
Te dev ji Siltana Namu berda û tu reviyayî...
Ji Qonaxa sê sae'ta çefî û egalê Mûs Xainê min,
Mîna mijê biharê li ber çavê min xuyayê..
Siltanê ban dikirê digo:
Mûsa mere, Mûsa mere, rev ne karê mêra ye,
Mûsa were mere, navê min derketiye bi navê te re...
Mûs Xaino were, mere,
Heger tu ê herî, darê eyneliyê deyne ji dotmama xwe re,
Tu ê li binê beriyê li qirpînê tifinga,
Tu li şerê qîzika Kurda binêre...
Mûsa Xain...
Sozê min bi qerarê te re...
Heya erda Şama şerîf tu herî,
Taxa Salihiyê, nav axalerên Kurdistanê, destê min bi te re...
Heçî ji min û te ji dû sozê xwe vegeê,
Bila kafir bi mi re, li ser dînê bêdînê here...
Bejna Mûs Xainê min zirav e,
Darê belalûkê şîn dibû, li bajarê Diyarbêkrê...
Li welatê Kurdistanê, li devê sûkê...
Sitiyê ban dikirê digo:
Mûs Xaino li te zavao, û sala vê salê li min bûkê...
Li te hêsîro û li min pepûkê,
Xwezila ji xeyra Xwedê ra,
Mûsa Xainê min li binê beriyê şerkî giran bikirana,
Bila heft sal û nîva di dû ra,
Bi destê Mûs Xainê min bigirtana, bavêtana ser bêlûkê..
Sitiyê ban dikirî digo: Mûsa Xaino!...
Bejna Mûs Xainê min zirav e, darê vê zeytûnê,
Şîn dibû li bajarê Diyarbêkrê, li welatê Kurdistanê,
Li ber darê mîrata telefonê...
Li te axao Mûs Xaino û li min Xatûnê...
Sitiyê ban dikir, digo:
Konê Mûs Xainê min li beravê,
Mûsa Xain, çogê xwe bide erdê,
Qayîşa kiçik mozoliyê li destê xwe bigerîne,
Mîna xortê Kurdistanê...
Destê xwe bavê ser darê devziravê,
Paketa lêxî û hesin bavê,
Heyanî ko bi ser min û te gihê gaziya mala bavê..
Konê Mûs Xainê min ji kona der e,
Stûna navê zêrê zer e,
Sala par vî çaxî, ezê ji qîza qîzek bûm,
û di mala bavê xwe de bûm,

Sala vê salê li binê beriyê laşê min î nazik î teze,
Kirine nîşana guleyê zer e...
Porê min î sor î sosinî mîna hûrikê zêra,
Li binê beriyê li tûmê xernûbê digere,
Bejna Mûs Xaînê min zirav e, biya sor e,
Şîn bû li bajarê Kamışlokê,
Li ber devê deriyê Qereqolê,
Şîn bû li zozanê Şerefdînê,
Li deşta Hezargolê,
Li welatê Kurdistanê...

Sitiya Nî'met axa

Evdilhadî Mihemed

Mûsa mere, bext ne wa ye,
kekê Kinê mereve, bext ne wa ye,
Êvare roava ye, soza berya ye,
Tengaya mala nêzîka kerya ye,
Delalê dilê mi suwar e, ne peya ye,
Suwarê şîn bozkê tu dibê ba ye,
Rextê enexdarê nava milê Kekê Kinê kuta ye..
Delal mereve, Sitiya Nî'met xezala Kurda,
birîndara pênc gulla ye,
Xwîna sor bi ser bejna zirav quba kemberê,
rûkê qonderê da rijiya ye,
Delalê dilê mi bi suwarbûnê li mala Cerba ye,
Rima mala Mehmed li ser piya ye,
Serê rimê çar gulukê zîvîn pêda berda ye,
Qayîşa enexdarê milê Kekê Kinê kuta ye,
Zincîra çogê buhustekê çar tiliya,
Ji pêxîla Kekê Kinê berjêr hêlkan daye,
Delal xayîno !
Ne bi gefan û ne bi gurra ye,
Ne halbûna çefî û e'gala ye,
Ne bi pesnandina qîzan û bûka ye,
Kanî wexta te e'gal xwar fikir,
Berdida nav çata herdu burya ye,
Îro hêsîr tengî ye,
Da'wa Ruha ye..
Ji berê da roja qewimandinê roja mêra ye,
Kekê Kinê mi go belkî roj biqewime,
Tuyê hefadiyê bikê, li orta Talanê Milan û Qere Gêçiya ye,
Delal! Mi go belkî tu Bender û Budûr û Hesenê Mihêmir,
hersê şiyûxê Gêsa ye,

Gullê destê suwara li canê Sitiya Nî'met bûne are,
Delal xaîno! Sitiya Nî'met, xezala Kurda,
Dîreka konê neh stûnî bi pênc gulla birîndare,
Mêze ke xwîna sor gulekî, bi ser bejna zirav da quba kemberê,
rûkê konderê da anî xware..

Xayîn lawê xayîna!

Mi go belkî rojekê roj biqewime koma Qere Geçiya,
ji te ra ne tu bare,

Mi nizanî bû tu fortekê nava mala, e'gal xware,
Delalê ne wa ye, bextê mêra de vaya ye,
Xwedê dîne, mala heçiya ye, mala kûra ye,
Bi destê Ubêdullah, kilê çavê Helîma kûra girtine,
Li korta Suwêrekê girtin, avêtin binê hebixana ye,
Kekê Kinê mere, rûne, şehkî lêxe, yekî bavê,
halana ewilê di xwe hilde,

Bê ez kilê çavê Sitiya Nî'met, xezala Kurda, bejin zirave,
Delal mere, xayîn lawê xayîna ! mere, bextê mêra ne were ye,
Bi şûnda li h'alê mi mêze ke,
Sitiya Nî'met, xezala Kurda, li pê te ye,
Bîst û çar derbê enexdarê li nava te ye,
Mi go belkî rojkê roj biqewime,
xortên Qere Gêçiya tamam ne barê te ye,
Qet damara namûsê vê êvarê li eniya Kekê Kinê tune ye,
Halana mêra ji delalê dilê mi ra bê fêde ye,
Mi nizanî bû tu fortekê nava mala, e'gal xwarê tewtewe ye,
Kekê Kinê buhara me buhareke rengîne,
Li besta Qizil-Ûzê rabû gula li bîne,
Kekê Kinê nereve, mi meterkîne,
Mêze ke Husênê pismam devê enexdarê,
û çîçika Sitiya Nî'met digerîne..

Agirê çapliya agirekî no ye, canê Sitiya Nî'met pir diêşîne..

Wê quba kemberê şe'ra kesrewan,
li devê enexdara xwe bigerîne,
Pol û poşman li dêmariyên mi Fatê û Fersê veogerîne,
Delal mereve, du derba biteqîne,
Heger tu ne mêre, here û enexdarê ji mi ra dîne,
Heft qeda li bedena Sitiya Nî'met keve,
Hîn tu du korta neçûye,

korta sisya ezê xwe ji par ra bi te gînim,

Bi destê Sitiya Nî'met bigre mi bi xwe gîne,
Bi oda kurê Birahîm paşa gîne,
Halan ewwilî di xwe hilde,

bibêje Kurda, xatûna pênsed malê Cerba,

kevoka çeng biçînim..

Siwaro

(Wey lo Siwaro !)

Wey lo siwaro ! Wey lo siwaro !
Heyran siwaro ! Çiya bilind e, ez te nabînim,
Destê xwe davêjim baqê gul û rêhan û nêrgiza naqetînim..
Li min û bavê min h'eram be,
di dû çavê Îsmaîlê Eyo,
ez tu dila li dinyayê nah'ebînim..

Wey lo siwaro! Wey lo siwaro!
Siwaro heyran, serê sibehê ez rabûm, min karek nekir,
Min destê xwe di ava sar û germ da nekir,
Min dî qereçî geriyan,
Min ji xwe re falek vekir,
Hatiye cewaba nexeyrê, ji min re gotiye:
Torinê dilê te keçikê girtine,
Bi destê Smaîlê Eyo kelepçe kirine,
birine stasyona Diyarbekir..

Wey lo siwaro! Wey lo siwaro!
Siwaro ez ne li vir û ne li wê mo!
Ezî perçakê ewrê reş ê li ser behrê mo,
ezî hûr harana tev li bê mo,
Ezî dosta Smaîlê Eyo, bavê Evdilqadir,
siwarê ciwaniya şê mo.

Wey lo siwaro! Wey lo siwaro!
Min dî dîkê nivê şevê, li min xulxuland,
Smaîlê Eyo, torinê dilê min keçikê daket hewşa mezin,
ciwaniya şînboz dixemiland,
Siwar bû berê xwe da welatê xerîb û xurbetê,
Ezê bi ser banê qesrê ketim,
Min sê denga bi dû de dinûhirand..

Wey lo siwaro! Wey lo siwaro!
Xopana gundê me bişewitê, rê di ber re,
Mi dî tabûra lawikên Kurdistanê,
bihurîn di ber me re,
Mi go: gelî xortino! ji we oxir be,
hûnê bi kû da herin?
Digo: emê herin bajarê Mûşê, li ser şer e.

Sînemê! (1)

Keçka gundê Sînemê,
Tu xeyidî li wê demê,
Şayî li dewsa xemê,
Roja şay û dewata,
Ez kilê çavê te me.

Keçik rîhana l'aviya,
Te dî bû l'ser xaniya,
Tena tena dimeşiya.

Mi dest avêt gerdenê,
Bi ser mi de ditewiya,
Weke kewanê li bûçiya,
Xuşîn ket toq û beniya,
Keçka gunda Sînemê.

Tu xeyidî li wê demê,
Ez mehbûbê dilê te mê,
Eman neman Sînokê,
Bejn terha bihokê,
Memik kirin wek gilokê,
Ez l'benda te mam şev û rokê,
Ezê Sînem birevînim,
Ezê bibim deşta Xarokê.

Sînemê! (2)

(Yar Sînemê!)

Taq (tak) rêhana li merge o !
Tu b'tenê (bi tenê) meçe avê o !..
Dest avête gerdenê,
Xweîn ketî navêyo,
Dikim Sînem ramîsim,
Gune (gunah) di stoyê bavêyo,
Yar Sînemê, Sînemê,
Hewara rebbê a'lemê,
Yar Sînemê, Sînemê,
Sitara rebbê a'lemê,
Taq (tak) rêhana li mêrge o,
Tenê meçe helala,

Demance Qeredax ji qibûrê deranî,
û li ser qehfê Smaîlê Xelîl danî,
Heyfa kevin û nuh, bi destê xwe hilanî..
Lawê Gurî, weleh, ez te nakim,
Tu bi şêx bî, ez te tewaf nakim,
Tu bi gul bî, ez te di ber serê xwe da nakim,
Mi go: "Ezê serê sibehê herim Smaîlê Xelîl ji xew rakim,
Ezê rahêjim misîn û leganê,
Ezê avê li desta kim,
Ezê bişînim Mûsil û Kerkûkê, e'bakê bînim, di nav mila kim,
Bişînim Sileymaniyê xencerkê bînim, di ber ra kim.."
Mi go: "Qey ezê Smaîlê Xelîl li Talatê bi zava kim,
Bi zavayê sê roja kim.."
Mi go: "Smaîlê Xelîl xortekî gelekî lê hêja ye,
Ezê li Talatê bi axa kim,
Ezê bi axayê Omeriya kim,
Min nizanî bû, ku ezê rahêjim laşê Smaîlê Xelîl,
di mezelê binya mala kim,
Smaîlo xeyre, bejna Smaîlê min zirave, mîna tayê ketê,
Şîn dibû di Talatê, li milê xetê,
Mi dî laşê Smaîlê Xelîl danîne gasîna dêrê, li ber mizgeftê,
Giriya kafir û misilmana bi h'alê min û te tê.."
De.. Lo, lo.. Gidî..lo Smaîlo !
Bejin ziravo ! nav qendîlo !
Smaîlo heyran! ji Talatê û heya Sîtê ((sîrtê)),
Xiyala xwe didimê, berf û baran bi kulî tê,
Diya Smaîlê Xelîl ji aliyê Midyatê, ji gilî tê,
Laşê Smaîlê Xelîl danîne dêrê, ber mescidê,
Giriya Smaîlê Xelîl bilind e, li Talatê sera, sera,
Lê dinêrim li kuleka, li şubaka, li pencera,
Mihemedê Gurî, kero ji wan kera,
Çawa te laşê Smaîlê Xelîl da ber xencera?!...

Stran

Şerkî ((şerekî)) dibû li Kûçe-Bano,
li Hesara şewitî, ji kula dilê mi re bi sê ciya,
Mi dî li ser serê Derwêş begê,
xweş hat hemînê mitralyozan,
Dengê sê payê mîratê çapliya,
gelek şehde û şihûdê Derwêş begê,
Mehmûd begê gelek hene...
Ban (bang) dikirin peyano, bavê mino!
Mêrê çê bin, çê bixebitin,

Emê mitralyosê dewletê bistînin,
Emê eskerê dewletê bişkînin,
Bila deng here sedareta Stanbolê, bigerê li hemî ciya,
Mi dî şerekî dibû li Kûçe-Bano,
Li Hesara şewitî, wa li we ye...
Mi dî Derwêş begê bi sê dengan ban dikir;
Keko Mehmûd begê, mi dî xweş hat dengê mîratê sûstema..
Dengê navtêdanê kurê bava, li ser serê eskerê dewletê ye...

Şerefo!

(Were kumê xwe!)

Ev kum ne kumê min e,
Kumê hevalê min e.

Silêbînê bi av e,
Siwar û peya da nave,
Şeref lawê Eysîkê,
Kum qetandin bi şîfikê,
Avêtin qeza Dêrikê.

Silêbînê bi tehlik e,
Şeref ban kir:
Ev kum ne kumê min e,
Kumê min ji hiriya berxik e.

Silêbînê bi rê ye,
Kum qetandin bi kêrê ye,
Avêtin qeza Dêrê ye,
Lo Kurdo! Were kumê xwe...

Şerê Jîl

Elî Serkêrî

Haye li min dewrane,
Gelî bira li min dewrane..
Min nezanî ve, çi dewre li min..çi zemanê ?
Ev çi bende li min..çi beyane ?
Wezê bi gera - Gerdiya ketim, li min çiyayekî zozane,
Di ser de kuhîstane, di ber de deşta Bîska li min germyane,
Siwarbûn heftsed siwarê Kemal paşa, li Navşar ê wêrane,

Tên û li binê vî çiyayê, serga ve deştê, çadir û xîvetêt xwe lê vedane,
Berî vî çiyayê Iraque, piştî vî çiyayê qeza Tirkane,
Helî Maweta heta tête hida ve Girane,
Çend rê diçin vî çiyayî, çend derî têda ne ?
Heme qolçî û mefreze û meaşxorê Iraqê,
nobedarên xwe lê daynane..

Ax çi bikim feleka reş felekê !
Piştî vî çiyayî qeza Tirkane,
Helî ser heta binê heme çadir û xîvetêt cendirmane,
Kula mewtê bikeve li mala Memedê Petew û Kerîmê Kelêtî,
Bo pêşiya mefreze cendirma bo hinda ve,
serê irz û i'yalê me qaçaxa şarezane,
Xelîlê Xoşevî ne li malê, yê li çiyayê Reş
li hida ve Ewliya, li vî herbê bê agane,
Nobedarê me qaçaxa teniştî wan kitriyê,
li pêşiya wan êsyîkane,
Di gel bangê sibêne horingenê topa,
ringîne fikerze leq leqe tematîke,
Li hida va i'rz û iyalê me qaçaxa kiriya tûx û dûmane,
Li vî irz û i'yalê giran bû qarî, hawar û weylî weylî û
yeman yemane,

Tifinga destê Ehmedê Nihadir Cembêzare,
Wa di destê Ebdulayê bira, birawo Elemane,
Ehmedê Nihadir bi sê dengê gazî dikite:
Ebdula birawo dest hilîne,
Bi navê hakimê xwe kem,
me çû mewla û meferet xwe nemane,
Recaya me kekê Cemal,
Birawo hawara me li dinyayê babê Luqmane,
Ezê bi gera Gerdiya ketim, sibeya li min tê bayê sare,
Tifinga destê Ebdula yî Elemane,
Wa di destê Ehmedê Nihadir Cembêzare,
Ehmedê Nihadir li vî herbê ne kir çî kar û bare,
Derbeka daû li bejn û bala ye Ehmedê Nihadir,
Bi navê hakimê xwe kim,
Li ber piştî zirav li min qetandî darê cîgare,
Ebdula bi sê denga gazî dikite :

Ehmed, birawo çî di gel te kir ?
Dibê: Birawo li bira, birayê xwe daneyne vî defterê,
Li ser birayê te sadir bû qelemê teqdîrê û moqederê,
Go deza tu texmîna xwe têda bike,
Bi navê hakimê xwe kim darê cîgare,
Li ber piştî birayê te biryê derê,
Ma em de çî kin di gel hakimê vî beyane,

Di gel amirê vê dewrane,
Ez di destê xwe deme darê Cembêzare,
Tu di destê xwe haveya qewda darê Elemane,
Di herbekê keyn li gera Gerdiya weku herba îmamê Elî,
û eşabêt dewre berê ku daketiya nav nihala Sîsebanê,
Min go bira li min buye wextê desta û tekgirtinê,
Min nizanî ve hakimê de li me kete mecalê desta û lekberdanê,
Li vê sehmê, li vê heybetê, horingenê topa, ringînê fikerzê,
Leq leqe tematîke, li hinda ve serê irz û iyalê me tê,
Ehmedê Nihadir bi sê denga gazî dikit:
Ebdula birawo, bêje irz û iyalê giran,
didestêxwe tek bigrin bi xwe pêk vebîçinevdexaletê,
Ma çî bikin di gel hakimê vê beyane,
Di gel amirê vê dewrane,
Min go ez di destê xwe deme darê Cembêzare,
Tu di destê xwe haveya qewda darê Elemane,

Şerê mala Nasir

De lê lê dayê, Emînê ban kir,
Hezarê rebenê, xezebê porkurê, Nûrê, korê şa'rê..
Lê, lê lê dayê bikin û bilezînin,
Xwe bi diyarê serjêr û giragînin,
Li serê baxan û beranê mala Nêsir temaşêkin.
Nemayê ji berê da şerê roja bazarê lehd e, î'da fila ye,
Li boxê û beranê mala Nasir nayê.
Emînê Ban kir: Hezarê, rebenê, xezebê, porkurê!
Hêvî sed carî hêvî,
Kanî û bestê Bişêriya şewitî, miçiqîne,
Bîrê Hêlê xwe dane nêvî,
Ji nîro bi şûn da li milê tapuyê,
Li panavê Quto, li rasta Zercelê,
Bêrimê xwînê xwedane qevdê xerzaniyê û qevdê zîvî...
Emînê ban kir: Hezarê, rebenê, xezebê, porkurê!
Xalidê birayê Hemîdê zava ye,
Husnî Nûrî biçûk e, segmanê sûstema ye,
Rizgan ji berê da li mala me axa ye,
Hesê Bişêrî, bavê Nûrê, maqûlê koma Bişêriya ye,
Heçiya Mehmed Eliyê Brahîm, bavê Xezebê,
Kinê gurover, qendîla camiya ye,
Kevrê dêra Ermeniya ye, qûça serseriya ye,
Çira şevreşa ye, gamêşê gêra ye,
Başê canfîda ye, serekê me hemiya ye..
Emînê ban kir: Hezarê, rebenê, xezebê, porkurê!

Zercel bişewite, bi genim e,
Ji êvara Xwedê da sûstema emîryê,
Li ser çoka Mehemed Eliyê Brahîm nalîn û him e,
Rizganê axê ban kir Mehemed Eliyê Brahîm,
Tu bavê min bî, tu yê îro li dev rûtê.
Mala Nêsir Hilê, hîn nezanin, zaran in,
Bira kozika bi Hemilînin,
Wek xam cwaniye, ser kada teb' û tora ne e'limin.
Emînê ban kir: Hezarê, rebenê, xezebê, porkurê!
Şarê lê dayê ! Dilê mi dilekî li dîn e.
Hûn bi navê Xwedê dîkin û dihebînin,
Hûnê bîskê bikin û bilezînin,
Xwe bi Diyarê ser jêran û gira gînin.
Emê bîstkê li şerê boxan û beranê mala Nasir temaşekin,
Ez nemînim Bişarê Çeto ban kir:
Hecî Mehmedê Mistê Reşkotî mêze ke,
Pênc siwar ji jêlî tîn û dilezînin,
Yek Husnî ye û yek Rizgan e.
Mi tu carî derbê giran ji destê wan ne dîne,
Hema bi tirs e ji siwarê şîn, bozê siwarê pêşîn e,
Ez nîşanê wî ji te ra hildim,
Wa ya Mehemd Eliyê Brahîm e,
Bavê Xezebê, kinê, gurover e.
Rojê yoxulmê giran bi ser kozikê lawê bava de dicadîne,
Kozê kurê bava daîm bi ser da hildişîne,
Rojê yoxulmê giran daîm sûstemê mîryê ji destê kurê bava
Derdixîne,
Îro mên be nava xwe bişidîne,
Pa bi qedrê Xwedê bî, em îro of û xweşya xwe ji destê bavê
Xezebê nabînin.
Emînê ban kir:
Hezarê, rebenê, Xezebê, porkurê!
Îro şerçîya (şerkaran) li mala bavê min û te şer bi dûr kir,
Şahidê Mehemed Eliyê Brahîm bavê Xezebê,
gelek hene, bi welîn e,
Lawê bava ra bi holbûnê,
Çefî û e'gala re bi urtînê,
Gamêşêgira re rahişt nava Xerzaniyê,
Hucumî ser koza Hecî Mehemedê Mistê Reşkotî kir e.
Kalo! Xwedê bi kul bê,
Têkeve mala Hecî Mehemedê Mistê Reşkotî,
Û ev dulezîzê ba file û Eliyê lawê Cibo gulakê lêxistine,
Li bejna Mehemed Eliyê Brahîm li hêla rastê,
Perçê cegerê bi qolon ve sor kirine.

Emînê ban kir:

Nûrê karê çira, mala Nasirê tefandine,
Ûcaxê mala Nasir ji binî da kul û kar kirine.

Emînê ban kir:

Hezarê, rebenê!, çi bû, çi ciriya?

Roj di nîro da şikîya,

Ber û barûdê segmanê mala Nasir lê qediya,

Îşev ez raketim mi xewneke nexêrê dî bû,

Mi dî govendek bi def û bi du zorna,

li hêşiya mala bavê min û te digeriya,

Mi dî serê çar boxê û Berana di qazana mala bavê min û te da,

Di qazanê holiyê bol û fire da, bi xwe dikeliya,

Şahidê Mehemed Eliyê Birahîm bavê Xezeb gelek hene,

Ji nîro bi şûn da li milê tapiyê hucûm kir ser kozikan

û gelek tabûya bi kersîxê xencera tev alîyan.

Emînê ban kir:

Hezarê, dêranê, Xezebê, porkurê!

Xwezî berê rokê pêşî da ez biçûma bajarê Qoce Erziroma şewitî,

Ser dikanê taciran û va miqşîya,

Minê bazar kira ji qîz û bûkê mala Nasir ra şer'an û temeziya,

Minê ji her çar beranê mala Nasir ra,

Bazar kira qeytanê kurka zencîrê sae'ta û kostakê şeşagira,

Cebilxanek du du derbê canfîdîya,

Şahidê Mehemed Eliyê Brahîm, bavê Xezebê gelek hene,

Nala (mîna) zêrkî ji zêrê meh'mûdî,

Tu bavî nav koma van mecîdiya, nala beranekî ji beranê.

Rizayê Xalid tu todekî soringike, qenarkî bibire,

Çelê mubareka havînê li Bîngola şewitî li Şerefdînê,

Berde nav mîhê lebençîya (mastkira).

Ez im, sed carî bi min ez im Bişarê Çeto,

Bankir Hecî Mehemedê Mistê Reşkotî,

Go mere xulama Xwedî nake,

Di ser Evdulezîzê ba fila re,

Ew ciwanmêra ji berê de siwarê kuheyranê nêr e.

Mêzeke îro sê ro, sê şevê wî qediyane,

File lawê file li şûna kozikê mala Nasir rûniştiye,

Gullê li şûna gullê na guhêze.

Emînê bankir:

Hezarê, dêranê, Xezebê, porkurê! Zercel bişewite,

Bi darê te re şahid û şuhûdê bavê Xezebê gelek hene,

Bankir Rizganê axa : Keko! Bi qesem be,

Ez îro ji ber Bişarê Çeto û Hecî Mehemedê Mistê Reşkotî,

Îsayê Mîrze nefîr a'ma welatê jorîn tev nagerim.

Emînê bankir:

Edê ban kir: Porkurê! Medê! Dêrika şewitî bişewite,
bi kevir gewr e,
Duxana çapliyê mala mala Osmanê Reşo li mabêna Kûra,
Dirba zinara Sior kirin ewr e,
Kuştine Mehmûdê Emer Beg,
Li ser kekê Qado rakirin axir dewr e.
Edê ban kir: Porkurê! Medê! Dêra şewitî bişewite, bi mêwa tirî,
Xwedê dîne, mala Osmanê Reşo, li zinara Sior, li Dara Kero,
Li pêşiya lawê Emer Begê difitilî,
Edê ban kir: Porkurê! Medê!
Ez ne ketime, ber kuştina lawê Emer Begê,
Ez ketime ber wê xemê ko meytê me ma bê Xwedî.

Şênî

(Ji berhevoka **Socin û Prym** – Petersburg 1887)

[Tîpguhastin: **Cankurd**]

(Go) Şênî deriyê hewşê me mermer e,
Alîk sor e yeke zer e,
Hecî nav herdu dila xerabî bike
Ne ji ummetê pêxember e,
Şênî me te dî bû li ser tirba,
Qutek sor û ez bi qurba (qurban)
Heke dê û bavê min ez dam,
Emê rêkin dûv miterba (mitriba),
Şênî baran hatî xumexum e,
Delalê min li Nisêbînê ji xwe taxime,
Derdê mi ne tişteke e, derdê min nivîştê dûrkime,
Şênî mi te dî bû ser bêderê
Te (tu) tizbî bide ser xencerê
Şênî tu were destê xwe deyne ser qubê kemberê
Şênî mi dî li hewşê rabû piya
Xwediyê dismalê momiya
Şênî were destê xwe bixe li bin
Kemberê bi xwer (re) bike bi çar tiliya
Şênî ez têr nebûm ji gotinê

Bejna mi hat firotinê,
Temaşa ke kêfa dine,
Şênî çima tu ranabê?
Şevik raze Emero ji nîzamê berde
Ew Mêrdîne va li jê re
Serê Eysê bi zêr e
Ew Mêrdîn e bê mesîl e
Melbûsê Eysê ji helîl e
Emero bi Eysê xwe qayîl e
Serê xwe ji balgiyê tu ranakê?
Tu çima rîwê (rûyê) mi ramîsan nakê?
Şênî bi reht (rext) û bi tufing e
Şênî rabû ser bêjing e
Şênî xwe avêt ser sîng e....

Şêx Neroz

şêx Nerozo tu zanî,
Ker vayî, kurtan kanî,
Şêx Nerozo, dongizo,
Kurtanê kerê şêx dizo!
Ey Naroz, Naroz, Naroz,
Kerê reş, kurtanê boz.
Ar tûtik, bervar tûtik,
Şêx Zîlanê, dûv rûtik.

Te d'bînim

Te d'bînim te nabînim, lê gewrê!
Dest li gerdenê wer tînim, cana min!
Aşiqê çavê şîn im, esmera min!
Qîza ji xorta distînim, delala min!
Tirsim bimrim nebînim, cana min!
Daketî ser kaniyê,
Şar berda ser paniyê,
Mi ramîsanek jê xwestî,
Ev heqê cîranîyê, delala min!.
Riya Eyin-Tirbê bi qaş e,
Paçê Zeko qimaş e,

Hek hon Zeko nas nakin,
Ereq vexwar serxweş e,
Tu dî bû, li ber dîwêr e,
Ez ji bejnê nebûm têr e,
Mi ramîsanek jê xwestî,
Tirsa min ji kûçikê mêr e.

Way lo.. !

Way lo, way lo, maqûlo Romî axawo Romî !
Mi dî tavê da bû ser xêlokê, diwanzde rima tav hilatin,
Kula Şamê tuyê bi kul bî,
Têkevî mala qeymeqamê, ku pê Ehmedê Berazî,
Çawîş û cendirmê vê Xelatê,
Çawa bi dû Bavê Ferîd, xaçerêka Wanê kirine ta'qîbê..
Axayê mi wiya nabe, maqûlê mi wiya nabe;
Îrada ku li ezmanê jorîn hatibe nivîsandin, li erdê betal nabe,
Heta fesadiya me Kirmanca hebe,
Kes ji maqûlan û ji axeleran, li ser rûkê dinyayê xelas nabe..
Şerekî dibû di geliyê Kêsê, li Axpînê,
Îzzet tuyê bavê xalê xwe, tuyê destê xwe bavê heqîbê,
Tuyê ji xalê xwe re bînî dûrbînê,
Ezê geliyê Kêsê ji teresê Romî bikim qesabxane, gola xwînê..
Axawo! wiya nabe, maqûlo wiya nabe,
Îrada ku li ezmanê jorîn hatibe nivîsandin, li erdê betal nabe..

Weyso!

Weyso, wey, wesîla ye,
Xanyê bav' Weyso ça mezin e,
Hina (hena) li desta, l' ser bazin e,
Tu par qîz bû, îsal jin e.

Xanyê bav' Weyso ça biçûk e,
Hena l' desta l' ser nenûk e,
Tu par qîz bû, îsal bûk e.

Weyso, Weyso, Wesîla ye,
Teşîrêse gilok bada ye,
Tama memkên te xweş in,
Wek xurmayê Bexda ye,
Wek şekirê Besra ye,
Sozek bû, mi' b t'er daye..

Xerabo !

(O..lo Xerabo!)

O, lo xerabo..!

Bi Xwedê û bi pêxember tu xerabî..!

Ez û xerabê dinê, li erdê binya mala,
em li hev rûniştin,

Me gilî kirin û me gazin hiştin,

Mi dî hêstirê çavê di reşbelek,
bi ser sing û berê te niqutîn,

Mi dî xilorekên devê çema, ji xwe re dimiştin,

Teyr û tiyûrê zinaran,
li h'alê min û xerabê min diponiştin,

Mi dî miriyê goristana, qendelê xwe li serê xwe gerandin,
di hindurê tîrbê xwe de rûniştin,

Mala bavê şewitiyo!

Mi dî bi kubara sibehê ra,

Te derbek fedawiyê bera min da, bi azana melê ra,
te ez ji xwe re dikuştim..

O, lo xeabo..!

Bi Xwedê û bi pêxember tu xerabî,

Gava bavê min tê odê, tu ji ber ranabî..

Malê dinyayê ne tiştik e,
tu xesîsî, tu qîmiş nabî,

Mi sûnd xwarî, di dû çavê te ra, ez nakim mêra,
ez kunda naynim dewsa şêra,
ez bergîla girênadim ser alifa kihêla..

O, lo xerabo!

Ew Tilimizê, ew Tilimizê, xweş Tilmizê..!

Mi sûnd xwarî, ez terka çavê reş î belek nadim,
heya xo ê şîn bê, qantir bizê...

O, lo xerabo!

Tu xerabê dinê,

Min ji te re nego:

Gula xwe mede bi sosinê,

Mîka xwe mede bi bizinê...

O, lo xerabo! .. Tu xerabî...

Xewna min

Fetûma ban ((bang)) dikirê digot: Xemrayê lê xwîşkê..!

Şevê çûyî mi xewnek dîye,

Serê sibehê ez rabûm, dilê min ji xewna min dixeliya,
Mi dî du seriyê berana,
di beroşa mala bavê min û te de dikeliya,
Serê sibehê ez bi çola Hesarê diketim,
Mi dî dengê çapliya, qeştî nê fedawiya,
Kozik bi hevdu ve qedimandine,
Peyayê mala Qito çepildirêjî,
Mala Nêsir bi qebtê xencerê Soraniya..
Fetûma ban kir Xemrayê,
Xwîşkê, porkurê, tirsê mi ji wê tirsê,
ku ji mala bavê min û te bikujin beranê pezkoviya..
Ezê rabim, berê xwe bidim bajarê paxir Ma'denê,
Ji mirîdê şêxê Zîla re bazar bikim sifr û sêniya,
Ezê herim bajarê Diyarbekirê.. (*neçûye serî*)

Xezalê ! (1)

Bejna Xezala min minare,
Ezê bi dua' çûme li ser e, bi silava hatime xware.
Ez terka çavê di reşbelek nakim heta li sîngê min
neyêt dengê tefşûya hebîbê vê necare.

Heyla gidiyê Xezalê, şêniyê û şepalê !
Tu pê bi şimikê, navteng bi kemerê, pê bi xirxalê !.
Ezê bi qurbanî qirka Kelabozê deqandî,
pozê dev û lêvê di şekirî.
Vê subehê ezê bi xulama bejn û balê,
Xezala min daketî yar di gunda,
Min sê cara xwazgînî andin mala babê nade.
Go gelî gundiya lomê ji min û Xezalê mekin,
Xezala min di mala babê da, pozî bilinde.

Heyla gidî Xezalê !,
Tu pê bi şimikê, navteng bi kemerê, pê bi xirxalê !,
Stu bi zêryokê ((gerdenê zêrîn)),
Ezê bi qurbana qirka Kelabozê, deqandî,
pozê dev û lêvê di şekirî,
ezê bi xulama bejn û balê.

Xezala min daketî li ber gola mezin,
Gavekê diçêrim, gavekê dibezim,
Nobê tiriya û nobê tinha ezim,
Ez bi êvariya sitarê gundê we me,
subehiya seydwane zerya ezim..

Heyla gidî Xezalê !, şênîyê û şepalê !,
Ezê bi qurbanî qirka Kelabozê,
Celagê ((çingalê)) gerdenê, dev û lêvê di şekirî,
Xezala min daket bû li vî banî,
Go şervana minê moxûl û bêjînga xwe,
li deşta Qîra, li ser deravê min hilanî,
Gelyê gundiya lomê ji Xezala mi mekin,
Çavê Xezala min ji eslê babê xwe reşin,
Hewce nînin subeyan û êvara, Xezala mi ra bikin bargiranî..

Heyla gidî Xezalê, şênîyê û şepalê !,
Tu pê bi şimikê, navteng bi kemerê !,
Ezê bi qurbanê qirka Kelabozê deqandî di pozê,
çilagê gerdenê, dev û lêvê di şekirî..
Go çiyaykê Şingarê bi dar û bî ne,
E'skerê Meh'mmed Elî paşa têgde begler begîne,
Meh'mmed Elî paşa li bextê te me,
Xezala min berde, berxêt vê birsîne.

Heyla gidî Xezalê !, di husnê û cemalê !,
Şoxê û delalê !, nazê û nazdarê !,
Xwezî bi stuyê şikestî
bi gerdenê xalxayî min tîfak Nesranî hilnegirt baya,
ez neçû biyama ji malê..

Go çiyaykê Şingarê barî bi zozane,
E'skerê Meh'mmedê Elî paşa têgde gorane,
Meh'mmed Elî paa li bextê te me, Xezala min berde,
balê li malê da berxî savane,
Go çiyaykê Şingarê vê bi zivîrke,
E'skerê Meh'mmedê Elî paşa çendî jêg (jê) firqe,
Xwedê mala Meh'mmedê Elî paşa xerab bikit,
Xezala min girt û vê kirî li navbêna xwe û kurk (ebaye)...

Têbînî:

(1): " Li **Zaxo** hatiye bihîstin û ji aliyê **Sosin û Prym** ve hatiye nivîsandin - **Berhevokên kurdî** - 1887 - Pétersburg ." û ji ber ku **Xezal** bi gelek cûreyan hatiye gotin, me hinek stranên Xezalê yên, ku kesin din belavkirine an bihîstine xistine vir, da ku xwendevanên hêja wan bide ber hev û lêkolîna xwe têde bike.

Xezal (2)

Dengbêj: **Subhiyê Diyarbekrî**

Go: hey Xezal im, Xezal im,
Xezalê çiyayê bi dar im,
Wezê ne li jor im, ne li xwar im,
Wez xwarina teyrê baz bûm,
Mi nizanî bû, li min rebenê,
ezê bibim xwarina Kundê d'kûr,
warî winda bim..

Qurban..Xezal im, Xezal im,
Xezalên beriyê çar in,
Diduyê stewr in,
Didu bi car in ((bi yar in)),
Her diduyê stewr, bi kêfa serê xwe digerin,
Her diduyê bi kar, li ser karên xwe stûxwar in..

Go: tê ji h'emamê, pile pile,
Mi dest avêt qevda gulya, hina ile,
Mi go keçê, dînê ka ramûsanekê,
Go: ûna ramûsana te sala çûnî hîna kule..
Go: hate taxa me barek tirî,
H'eb li h'ebê, lo di gindirî,
Xwezya min bi wê qîzê, bi wî xortî,
Bi çavê serê xwe dî, bi dilê xwe zewicî.

Çiyayê Mêrdînê kakil û kuncî,
Jê firiya cotek kewê di narincî,
Xwezya min bi wê qîzê, bi wî xortî..
Bi çavê serê xwe dî, bi dilê xwe zewicî,
Go: hatî taxa me bi lo..lo..ye,
Lê digeryam şev û ro ye,
Mi navê narînê xwe, qe nas nekir,
Tarî navê narînê min H'emo ye.

Bejna zirav, xweş qanûn e,
Gulî li ser mila bela bûne,
Çavê min li rêya te qerimî,
Me nizanî bû, ku mişterî li keleş gewra min rabûne..
Rûçkê te nanê genimî, tu ne dikenî, ne dikemilî,
Bav û dê ya te ne wer bûn, vê qapana mezin ji ku e'limî ?..
Mi çi gotî, tu xeyidî,
Ava gola li me cemidî,
Giyayê mêrga li me seridî,
Çûna te sal îsal..!
Terka mi kir yekê din dî..
Navê te filan û bêvan,

Sing û berê xelkê delal, bûne buxçikê gul û sêvan,
Xwez ya min bi wê hîngê,
Bisk û simbêlê min û te li hev û du bibin mêvan.

Mi te ne dî îro du ro,
Derî veke wer hinduro,
Xwez ya min bi wê sae'tê, bi wê gavê,
Ez bêm keçê, tu bê kuro!!..
Mi te ne dî îro şeş e,
Bejziravê te çav reş e,
Çi wextê, ko min te nedî,
Fincana jehrê bi min xweş e.

Mi te dî bû l'ser xanika,
Mi ban te kir bi tilika,
Mi go were keçê, dînê,
Ramûsana xweş e, bi dizîka...

Ez kewek im, j' kewê tal im,
W'ez l' ser zanîkê mala bavê te dinalim,
Xelk hewceyê malê dinê, min hewceyê çavê xal im.

Ez kewek im, j' kewê şîn im,
L' ser xanîka mala bavê te dixwînim,
W'ez çavê xwe li her wext, qonax, qonax digerînim,
Yek li wê qamê, li wê têmtêlê qe nebînim.

Tu li ser bana çi digerî?
Penya çizmê meke herî,
Tu li fermana serê xwe û li serê min digerî?...

Mi dîtibû li binê sêvê,
Cixare vexwar bi serê lêvê,
Mi çi kiribû, tu enirî?
Tu xeyidî, bi min naxêvê.

Bejna zirav mi rahiştê,
Ji kember kirî, bidim piştê,
Mala fetan û fezûla bişewite,
Qe nehiştin, ez têr rûnim li teniştê...

Riya Şamê kursî mirsî,
Her çî hat û min lê pirsî,
J' mi re gotin delalê te bi çi nîşan e?

Mi got: Bi kirasê kitan, bi terpiyê nifsî.

Ez li hember, tu di hember,
Xwedan barî misk û e'mber,
Heyfa ko li wê heyfê tê,
Keçik gewr e, lawik esmer.

Mi te dî bû, li ber sefê,
Tizbî qet'ya kete kefê,
Xelk evdalê malê dinyê,
Ez ewdala çoka rastê,
L' bin MiŞefê...

W'ez nexweş im, ta digirim,
Roj bi rojê xirabtir im,
Heke carek te dibînim, ji doh û pêr, ez çêtir im.

W'ez nexweş im, were ser min,

Guhê lihêfê hilde, têkev ber min,
Eger dê û bavê min gotin,
Kiyê ne kiye?!..

Ezê bêjim:

Hekîmê Luqman hatê ser min,
Navbira min û te dîwar e,
Pihnek lêxe, bîne xware,
Heke dê û bavê min gotin:

Kiyê ne kiye?

Ezê bêjim: Yabo!..Yadê!..

Şev reş e, diz hezar in..

Têbînî:

(1) Binêr: Rojnameya **Roja Nû** (23.08 û 30.08.1943) Beyrût-Lubnan.

Xezalê ! (3)

Bejna Xezala min minar e,
Ezê bi dua' çûme li sere, bi silava hatime xware.
Ez terka çavê di reşbelek nakim heta li sîngê min
neyêt dengê tefşûya hebîbê vê necare.

Heyla gidiyê Xezalê, şênîyê û şepalê !
Tu pê bi şimikê, navteng bi kemerê, pê bi xirxalê !.
Ezê bi qurbanî qirka Kelabozê deqandî,
pozê dev û lêvê di şekirî.

Xwedê mala Meh'mmedê Elî paşa xerab bikit,
Xezala min girt û vê kirî li navbêna xwe û kurke...

Têbînî:

(1): " Li **Zaxo** hatiye bihîstin û ji aliyê **Sosin û Prym** ve hatiye nivîsandin - **Berhevokên kurdî** - 1887 - Pétersburg ."

Xezal (4)

Dengbêj: **Subhiyê Diyarbekrî**

Go: hey Xezal im, Xezal im,
Xezalê çiya yê bi dar im,
Wezê ne li jor im, ne li xwar im,
Wez xwarina teyrê baz bûm,
Mi nizanî bû, li min rebenê,
Ezê bibim xwarina Kundê d'kûr, warî winda bim..
Qurban..Xezal im, Xezal im,
Xezalên beriyê çar in,
Diduyê stewr in,
Didu bi car in (bi yar in),
Her diduyê stewr, bi kêfa serê xwe digerin,
Her diduyê bi kar, li ser karên xwe stûxwar in..
Go: Tê ji h'emamê, pile pile,
Mi dest avêt qevda gulya, hina şile,
Mi go keçê, dînê ka ramûsanekê,
Go: Şûna ramûsana te sala çûnî hîna kule..
Go: Hate taxa me barek tirî,
H'eb li h'ebê, lo di gindirî,
Xwezya min bi wê qîzê, bi wî xortî,
Bi çavê serê xwe dî, bi dilê xwe zewicî.
Çiyayê Mêrdînê kakil û kuncî,
Jê firiya cotek kewê di narincî,
Xwezya min bi wê qîzê, bi wî xortî..
Bi çavê serê xwe dî, bi dilê xwe zewicî,
Go: Hatî taxa me bi lo..lo..ye,
Lê digeryam şev û ro ye,
Mi navê narînê xwe, qe nas nekir,
Tarî navê narînê min H'emo ye.
Bejna zirav, xweş qanûn e,
Gulî li ser mila bela bûne,
Çavê min li rêya te qerimî,
Me nizanî bû, ku mişterî li keleş gewra min rabûne..
Rûçkê te nanê genimî,
Tu ne dikenî, ne dikemilî,

Bav û dê ya te ne wer bûn,
Vê qapana mezin ji ku e'limî ?..
Mi çî gotî, tu xeyidî,
Ava gola li me cemidî,
Giyayê mêrga li me seridî,
Çûna te sal îsal..!
terka mi kir yekê din dî.... (*neçûye serî..*)

Têbînî:

(1) Binêr: Rojnameya **Roja Nû** (1943-1946) Beyrût-Lubnan.

Xezal (5)

(Ev parçe yê strana kurmancî min ji devzarê **Eliyê Heyder** girtiye. Berê jî **Dr. Husên Hebeş** ev stran ji dev wî bihîstiyê û di nivîsara xwe ya ku bi navê "**Çend stranên folklorî**" sala 1987'ê li Bexdadê bi tîpên erebî belav kiriye. **Eliyê heyder**, ku niha li Almaniya dijî, kurê dengbêjekî hêja ye ji herêma Çiya yê Kurdan li rojava yê Kurdistanê)

Ay lê xezal, lê lê xezal evdal,
Sêrke li bajarê Diyarbekirê kofxara;
Li bajarê Bexdadê va sêvgula, va minara.
Belxa Sûsê, deşta Heranê, dev suwara
Mala min danî Nûr a Elo, Keça Muqsî Papo,
Sereka rinda, çira şevreşa,
Bînxweşka xurta, lewenda bûka,
Dêmguliya, ser bi pera,
kum bi têla, enî bi riba,
Birî qeytana, çav beleka,
Lêv tenika, diran hûra,
Ziman zirava, çeng qilûça,
Guh bi guhar, sitî bi zêra,
Dest heneya, ling bi xirxala...
Xezal, evdal, te mala min danî va hafa xara,
Ji êvara îne, şeva bext û miraza,
Te agir berda hundirê mina,
Te pişta min da dîwara.
Ay , Ay ,Ay Xezal, evdalê te me...
Fîstan zerê, fîstan sorê,
Mala bavê te ji mala me da ferqe, hewderê,
Te ez kuştim bi wê keserê,
Rojekê ji roja Xwedê,
xwe bide ber xemla kurmanciyê,
Xemla giran, û ji jor da holbê, werê,
Ez li bîra Xwedê me, bila kulek di mala bavê te kevê,

mînan kula sala berê..

Te h'alê min ne hêşt, u'mrê min çû bi wê kulê, wê keserê,
Min bi teresê bavê te nikanî ,
belkî Xwedayê jorî li heq wî bi derê,
Ay, ay, ay Xezal, evdalê te me...

Ay lê evdal ! bila Diyarbekir bişewitê, li aliyê tewrî jêre,
Ne bazirganê Hind û Hindistanê nemane, gişt ketinê,
Sîng û berê xelkê minî fodil û bûkînî,
Sîngê kal î gewr, Xwedêyo! sîngê nûrî,
hincasa Mêrdînê,
Hulma Kuslerê, hingivê Sîrtê,
Bastiqê Cêrmîkê, xurma binî Bexdadê,
Zebeşê Diyarbekirê, qawînê golê Meraşê, sêva Qeyasê,
Xwedêyo ! ne sîng û berê nûrî,
ji min ra ne dibû bîstanik ji bîstanêd şimamoka,
Li qurma Qerejdaxê, li nav goçerêd U'merîka,
Di bin bûz û leylana hişîn da,
Rengdayî, ketî mecalê xwarinê ,
Lawok aşiq bê , keçik bengî bê,
Dilê herduwan li hev hebê,
Teresê bavê temah'kar bê,
Tolê dayê fitnekar bê,
Çav li çar kêl û kepeka çê bê,
Bila werê mecalê diwanzde pismama, bi şîng şîngê şûran bê,
ber serjêkirinê,
Bila werê mecalê heft bira pî kulapçekirinê.
Bila werê mecalê bavkî kal, dayka pîr,
Qor qora " **Yasîn** " xwendinê,
Xulî bi nav çavkirinê.
Ay ,ay , lê, lê , lê Xezal, evdalê te me.

Erê ! Xwedêyo ! ne min bal û zêna xwe dayê,
li ber mala bavê Nûra Elo dibê,
gump-gumpa defê, totoya zurnê,
lîliya keçan û bûkan,
haw-hawa sîwaran, deh-duha lokan,
Xwedêyo ! ne xelkê min î fodilî bûkên sîwar dikirin,
Pêlkên sor û mor davêtin nav tok û mehfan,
Dibirin ji yekî ne meriv ra,
Ji kobkikî nav malan ra,
Ji teresekî nav gundan ra,
Ji dêlbijkî mejvan ra,
Evdal ! di pê te ra, agir bi hundirê min ket,

Mala min şewitî, ûcaxê min kûr bû,
Di pê te ra, evdal ! min pişta xwe da ber kevira,
Derdê eşqê da bû ser derdê mirinê,
Ay, ay, ay evdalê te me...
Fîstan zerê, fîstan sorê,
Fîstan sorê, dol bi dolê,
Ûşta xatrê te salikê û şeş mehan
Li ber mala bavê te ez bûm şivanê çolê,
Te ez har kirim û dîn kirim, te ez berdam çolê,
Ez nizanim serî xwe ku da ragirim,
Ku da herim ji dest te tolê ?
Ay, ay, ay evdalê te me..lê , lê...

Lê lê Xezal !, evdal !
Bila Diyarbekir biewitê dar bi bedenê,
Sîng û berê Nûr a Elo, keça Moqsî Papo.
Ji min ra nedibû mastê cemedê,
Ne dibû mastik ji mastê goçeran,
Ji meha biharê, ji kela yekan,
Ser şekir û bin xurme ne,
Ay, ay, ay evdalê te me...

Lê, lê Xezal ! evdal !
Xumirtî lêketî li çiya û baniya,
Li mêrg û dûza,
Li çem û kaniya,
Ne min digo: bejna Nûrê ji min ra,
 zirave wek minara mizgevtâ,
Sitiyê evdalê wek şîşê lêvdorê,
Seba xatrê Nûrê ez bi qurban,
 koma esmera û zeriyan,
 çê û xirapan gitan,
Ay , ay , evdalê te me, lê, lê....
Lê lê Xezal ! Mêrdîne, xweş Mêrdîne,
Di ser ra çiyaye, di bin ra kanîne.
Li serê xelkê min î fodilê bûkên salik kîbare,
Gul bi gul dor bi çîne,
Sê gul di ber ra kirrîne :
Yek sor, yek sipî , yek rengîne,
Li nava xelkê min î rindik kemberek zîvîne,
Çaprazê kemberê bi hev xistîne,
Poz qule, tê da têlek têtarkîne,
Ezê bal û zêna xwe didimê, dîsanî bextê min î reşe,
Ezê çêkesikî ji ku bibînim, bi çeplê min bigre,

bavêje ser pišta bergîrkî,
bervê min bigerîne,
Cihê keçan û zeriyan, hêdî hêdî min pêgihîne,
Ay , ay evdalê te me....

Li serê xênî mêr û jine,
Li binê xênî ez û tune,
û destê xwe bi dest î min de,
em herdu bi hev ra birevine,

Wextê xelk û a'lem rastî me hatin û pirsîn:
" ma hûn ku da derin, direvine "?
Emê bibênê : " *loma mekin ! emî li ber qanûna
Mustefa Kemal direvine* " .

Ger înan nekirin, emê bêjin:
" *Em herdu xûk û birayê hevdu ne,
bavê me yeke,
dayîka me dudu ne* " .

Xelkê bêjin : " *na welle, hûn yar û dostê hevin,
bi hevra direvine* " .

Xezala Kurda û Teyar axa (*)

Ji ber ku min xwast çende rengên strana Xezalê bidim nasîn, min dît ku wê çêtir be, em parekê ji "**Xezala Kurda û Teyar axa**" bixin ber van parçeyên dinê û bi taybetî ya **Eliyê Heyder**. Xezala Kurda ji aliyê **Dr. Celîlê Celîlî** ve sala 1985 li Ermenistanê di pirtûka "**Zargotina kurdê Sûriyayê**" de hatiye çapkirinê. Ev stran jî ji devzara stranbêj û tembûrvan **Adî** yê Hesnecar e. Ew jî mîna **Eliyê Heyder** xelkê herêma Çiyayê Kurda ye. **Dr. Şukir Mustefa** ev parçeya hêja bi tîpên erebî bo govara "**Beyan**", hejmara Hizêrana 1986'ê amadekiriye. Min ev parçe ji vê stranê ji tîpên erebî wergerandiye, lewre hêvîdarim, ku çewtî û şaşî kêmbin.

Stran:

Ehmed axayê Mendî, bavê **Xezala Kurda** û **Zor Elî** axayê **Tîmarî** bavê **Teyar**, emê ji we ra bêjin, herdu birayê hevdune, Bê hevdu şîvekê naxun û gelekî hej hevdu dikin, dûreyê zarokê wan zewicîne û hîn ji hevdu cihê nebûne û di raya hevdu da ne, gelek tifaqa wan başe bi hevdu ra.

Salekê xela heywan û însan bi ser wan da hat. Gelekî halê wan şerpeze bû. **Zor Elî** axayê **Tîmarî** ban kir go:

- Lawo! birê min ! Xelaye û eşîra me girane, û eşîra wan jêr dibêjin eşîra **Menda**, eşîra me girane, em li kîjan erdî daynin, kes nikare berê me hilîne. Emê bivin (bibin) du perçe, nîvê eşîrê tu bi xwe ra biv, nîvê eşîrê ezê bi xwe ra bivim, heta gi însanin li ber barê me rabin, karbin rehmê li me bikin, me vehevînîn (bihewînîn).

Birê wî go: - Birê min! Bê te nabata min nabe. Wextê tu ji cem mi herî û ez herim, xezo hene, şer hene û îş hene û xelk timaya malê me dikin, wellehî, bê **Ehmed axayê Mendî**

bavê **Xezala** Kurda em nikarin biqedînin li çola.

Go: - Dibê, ya em giş biqelin.

Civa dan bala xwe. Êvarê bi hevdu ra şêwra xwe kirin û rûniştin ji xwe ra we'dekî bidin bi hevra.

- Êvarê, Go: - Dibê firsan û egîtê **Menda** nemînin, giş li odê bicivin, emê ji xwe ra bişêwirin. Herdu birê mezin rûniştîne.

Ê, hê, herê, herê, herê, herê, herê, herê, lo...

Herê, mîrê mino, dilê min li yane,

Belê, begê mino! dilê min li yane,

Eşîrê Mendê eşîrekî zehfî mezin girane,

Wê rojê herdu ji hevdu bûne du perçe,

Nîvê dîsanê danê du Zor Elî axayê Tîmarî, bavê Nazlîxane,

Dîsanê hersal vî çaxî xortê Menda,

Şev lê dixistin li pozê qunderane,

Û destê xwe davêtin quborê demançane,

Ev bûne şivanê colê miyane..

Erê, erê, erê, erê, erê, erê, erê, lo...

Erê, erê, erê, mîrê mino, lo

Ê, begê mino, dilê min li yane,

Wezîrê mino, dilê min li yane..

De bi ser wan da hatî xela û celakî ezîmî girane,

Heçî Zor Elî axayê Tîmarî, bavê Nazlîxane,

Qelbê li hudûdê pîrkan axayê Êzîdxane,

Bê bav û nahêle teyr teyraniya,

xwe deynin li mêrg û çayîr û Êzîdiyane,

Wê rojê dîsanî, nîvanê şevan û pêva, helalê wan kûmişî erdê,

Dên û bala xwe dayê dîsanî gul û nefel çar tiliyane,

Konê reşî erebî çerxandin erdê,

bûyî şingînê gumgum û misînê qehwane,

Mij û morana qehwê dîsanê ewr digirtin li ezmanê heftane,

Sibê qîz û bûk derketin dêran kone, dîsanê ji xwe ra piştîyane,

Belê, begê mino, terqînê dîsanê dêwa, kolpînê dewmeşkane,

Hema wê rojê gelekî kêfa wan tê,

Dibên: - Ya rebbî Xwedê tea'la em xistine fireyê,

Li hudûdê kirîfê me Pîrkan axayê Êzîdxane..

Herê, herê, herê, herê, herê, herê, herê, lo...

Herê, herê, herê, mîrê mino, lo,

Ê, belê, begê mino! dilê min li yane,

Herê, mîrê mino, dilê min li yane,

Dîsanê wê rojê Pîrkan axayê Êzîdxane dinêrî,

Gi çi konekî bê edet, dîsanê êlekê danîne,

Li hudûdê Pîrkan axayê Êzîdxane..

Bêbavo xûn bi pêsîra xwe va dî,

Go: - Ezim Pîrkan axayê Êzîdxane,
Ezraîl, Cibraîl melkemewtê nikare biqedimin erdê me,
Erdekî bi xudane,
Ev zalimane ya xerîbin, ya hesabê mêra nakin,
li erda xwe da ne,
Lawo, bighê wana, bê konê kê ne, bê sual û bê cewab danîne,
Li hudûdê Pîrkan axayê Êzîdxane, lo..
Herê, herê, herê, herê, herê, herê, herê, lo...
Herê, herê, herê, mîrê mi, lo,
Herê, mîrê mino! dilê min li yane,
Belê, begê mino, dilê min li yane..
Wextê van suwarê kirîfî me Êzîdiya hatin digotin:
-Xêre? We helane hûn nizanin ev erd dîsanê xwedî hene,
ser van erdê hane.

Go:- Lawê mino, nexeyidin, em zilaminî xerîbin,
Weke teyrê çehvgirtî me danîne li vê erda hane,
Heger Pîrkan axayê Êzîdiya acize,
Bi xatirê we, emê konê xwe barkin,
Em zalmê xerîb, weke teyrê çehvgirtîne,
emê barkin ji erda xudane,
Em bi xwe tu car û tu car di erdê xelkê da asê nabin,
Em zilamnî xerîbin, heger acizin,
Dîsanê emê sibê êlê xwe barkin, bimeşin ji vî erdê hane.
Herê, herê, herê, herê, herê, herê, herê, lo...
Herê, herê, herê, mîrê mi, lo,
Herê, mîrê mino! dilê min li yane,
Belê, begê mino! Dilê min li yane..
Evan feqîra wextê veqeriyên,
Dîsan digotin ji Pîrkan axayê Êzîdxane,
Digo:- Axayê min, bi xwedê devê me negeriya,
Em ji wan ra tu cewabê bivin, hingî ji me ra galegalek gotin,
Jêr dibêjin Ehmed axa, dîsanê, Zor Elî axayê Tîmarî,
bavê Nazlîxane,
Dibê, eşîrê me, eşîrê Menda, eşîreke girane,
Bi ser me da hatî xela û cela girane,
Me dinya kêl û pêjing kiriye,
Xwe girt li nav û dengê kirîfê xwe, pîrkan axayê Êzîdxane,
Hema vê mehê nikare li ber barê me rabe, li erda xudane?
Herê, herê, herê, herê, herê, herê, herê, lo...
Herê, herê, herê, mîrê min, lo,
Herê, mîrê mino! dilê min li yane,
Belê, begê mino! Dilê min li yane..
Wextê ji Pîrkan axayê Êzîdî digotin, digo:
- Îja (îcar) a wan kete stiyê me, bi qesem navê Xwedane,

Ê me dîsanê edeta êl li ser êl dayne,
Mal li teniştê malê dayne, biezimîne ezîma girane,
Wê rojê dîsanê evan go: - Emê we bi ezmînin,
Van go: - Na, welleh, heq li ser me ye,
Êzîdî, em we bi ezmînin li ser erda hane,
Dibê wê rojê dîsanê Pîrkan axayê Êzîdxane,
dikete nav eşîrê Êzîdxane,
çiqa xortekî munasibî, paqijî, cindî hebe,
civandin li dîwana girane,
Sed bexê dîsanê tamam serjêkirin dîwana girane,
Ban (bang) dikir: - Xuwa min, Zelîxatûnê,
bejin û bala zirav bide mee'dana zêrane,
Newq weke şitlek rêhane,
Çehf weke du steyrê qorkê (xorkê),
hiltê mêzîna li ezmanane,
Bêbavê, tu divê subhanella,
ya rebbî, tu dibê ro nedîtîye li heyata alane,
Herê, herê, herê, herê, herê, herê, herê, lo...
Herê, herê, herê, mîrê mi, lo,
Herê, mîrê mino! dilê min li yane,
Belê, begê mino! dilê min li yane...

(*) Bo teviya stranê, binêr li "**Beyan**" hejmarê hizêran 1986'ê.

Xidir

Hey Xidir, Xidir, Xidir,
Li ser minara ban dikir,
Her ji du riwa tim li vir.

Xidir hiloş biloş,
Teres lawê kerfiroş,
Xidir tê û dilezîne,
Ba li bêrîkê dixîne,
Ji xelkê weyê micîdî ne,
Hemî rişk û sipî ne.

Xidir çû ye Mêrdînê,
xwe ji eşq û dila dihejînê,
Xidir çû sûka kera,
Nan kirî bû b'deh pera,
Li Mêrdînê, kir xela,
Çavê teres li teşxela.

Hey gidî, gidî lo Xidir,
Her ji du riwa tim li vir.

Xizêmê!

Derdê Xizêmê,
Tîrka li bana,
destê min kin bû,
Ne g'ha guhara,
Belê ez dinalim,
Ji derdê keleşyara,
Xizêm winda bû,
Der ban û bana,
Xwediyê xizêmê,
Xizêm winda kir,
Tev li zencîrê,
Tev li zencîrê,
Ez hatim Cizîrê,
W'ez çûm Cizîrê,
Xizêm winda bû,
Tev li zencîrê,
J' derdê keçika,
Binê' ez bêhal im, ji derdê keçika re.

Ez dinalim,
Ji derdê xwediyê xizêmê'r,
Ez ketim vî halî,
Xizêm winda bû, tev li zencîrê.

Ez diç'me Cizîrê, Cizîra Bota,
Xizêm winda bû, l' govenda xorta,
Ez xizêmê nadim, bi sê gayê cota,
Xizêm winda bû, tev l' zencîrê.

Ez d'bême odakê, odate tije,
Fincanê qehwê, erdê dimije,
J' derdê xwediyê xizêmê'r,
Ez ketim vî halî,
Xizêm winda bû, tev li zencîrê.

Diçime odakê, odaka vala,
Fincanê qehwê erdê dimale,

Hey la ez nexweş im,
Te çî huwal e,
Ji derdê xwediy' xizêmê'r,
Ez ketme vî halî.

Xurfanê!

Doy, doy, Xurfanê...!
Xirbê Qeplo bilindcê,
Kurika Çeto Altincê,
Dimsfiroş in Kermêtî,
Şikêft pir têde Kersivanî,
Serê diyar de T'afî,
Kundê şkêra Zihnî,
Du bîr têde Mercî.
Hatim aliyê vî alî,
Qamkutik in j'xwey Golî,
Ardê cehê Metînî,
J'bo gelaciyê Biyêrtî,
J'xewa şevê ra Merzikî,
Gundê mezin Mehsertî,
Çîm werqilê di Qelaçî,
Keçkê di xweşik Ziyaretê.
Ez hatim aliyê vî alî,
Serê diyêr de Êdwî,
Ser bi ribê Rişmilî,
Hek tu l'jinê çê digerî,
dakev tixûba Rengî.
Jinê d'bî (jinebî) xwedî sêwî,
Xwediyê ta'b û sêfilî,
Mi heft sala şivanî,
Û m'hheft sa;a gavanî,
Nanê heqê jinik bî.

Zekiya

Eman, eman Zekiya,
Ez xulam bisk û guliya,
Bihna misk û e'nberê,
Ji memika fûriya,
Te dî bû l'ser xaniya,
M' dî bû l'ser xaniya,
Tena, tena dimeşiya,

Mi dest avêtê xebxebê,
Bû xuşîna mûriya,
Ez ketim dilim êşiya,
Bi ser mi de ditewiya,
Wek kevanê li Bûçiya,
M' devê xwe xist gerdenê,
B' ser devê min de h'eliya.
Ramûsan pir şîrîn in,
Wek şekirê elbika,
Mînayê qeymaxê miya,
Tim l' serê biharê,
L'ber beg û mîrzaya,
Eman, neman Zekiya.
Mi Zeko dî l'ber dî wêrê,
Mi dî şewqa kirikê,
Dayê cotê guhêrê,
Mînayê serik penêrê,
J'mehbetê ez nebûm têrê,
J'kê tirsê û j'kê newêrê,
Tirsa wê j' kûç'kê mêrê.
Eman, eman Zekiya,
Ez xulam bisk û guliya,
Bihna misk û mehwerdê, (gulavê)
Ji memika fûriya.
Mi Zeko dî l'ber neqebê,
Çêkir fitla qesebê,
Kulê Zeko giran bû,
Da ser derdê kezebê,
Eman, neman Zekiya,
Ez xulam bisk û guliya.
Zeko zînê seyranê,
Kewoka qehwexanê,
Li wî siwarê, li meydanê,
Kêroşka tajî berdanê,
Ne kuştin û ne gihanê,
Rû sohir ji ramûsanê,
Li ser dîn û îmanê.

Yadê!

Delîlê Yadê!,
Ez mêr nakim, mêr tu nîne,
Ez axa nakim,
Zilmê û qayîşê dikişînê,

Ez şêxa nakim,
Erê şêx in, cilê wan şîn e,
Qelbê wan reş e, wek tenî ne,
Ez şivana nakim,
Tim daw û dêlê wan bi herî ne,
Ez gavana nakim,
Tim ling qelişî ne,
Ez mela nakim,
Tim bi qelem û dewêtkê,
Qayîşa xwe dikişînin,
Ez dowilmenda nakim,
Mal genî ne,
Ez feqîra nakim,
Li ser çavê xwe nagerînim,
Ezê dakevim binê beriya jêrî,
Yekî e'rebê çeng sipî ji xwe re bineqînim,
Bila mêra bikuje,
Gelha li mala bavê min vege'îne.

Zeynebê!

Eman, ne man Zeynebê!,
Li ser şa'ir qesebê,
Bila tembiya min li te bê,
Li civanê miqate bê,
Ji xewka şêrîn ranebê.

Eman, ne man lê Zeko!,
Tu bi qedrê rebê xwe ko,
Tu ê bişkoşkê xwe veko,
Devê min di memkê xwe ko,
Ez zarok im, nezan im,
Bêdiliya lêwik me ko.

Eman, ne man Zekiya,
Berfa bi şev bariya,
Li ser zimana heliya,
Ez ketim dil im êşiya.

Kul ket mala gundiya,
Ji reşka re û rîsipî ya,
Ji xilaf Xort û naşiya.

Sergotina X.S. Şino ya, ku li gel beytê bû:

Ev beyte êke (yeke) ji wan beytên egereka olî (ayînî) têda diyar diket, yanê egereka bisurmantiyê (musilmantiyê) û deq bi deq ya hatiye nivîsîn bê çî destkarî û destvedan û çaxê vê beytê bara (behra, para) pitir dizvirîte sedê nozdê, yan mirov dişêt bêjît çaxê mala Bedirxanî û hozanvanê wê yê hevçerx biye (bûye) digel çerxê vê binemalê.

Ev beyte ya ji mirovekî hatiye wergirtin bi navê (Hesenî) li gundê Spîndarê li roja 17.01.1982, he jî gotinêye, ku jiyê vî mirovî pitir bû ji pêncî sala û li havîna 1985 dunya ron ya lê tarî bûy. Gelek ji rêzên van beyta bi dubarekî kirîne, lê min wesa nivîsî wekî deq û bê çî destkariyên biçûk jî.

Ma Zeynel begê nezan e,
Ma Zeynel begê nezan e,
Av negirte sêrcixan e,
Ne xarin tam û tea'm e,
Dê heta neh roj tamam e,
Ma ji zad û av û nan e,
Dê hella hella Zenel beg,
Ma barîkellah Nûrî beg,
Ma sed aferîn Xalid beg,
Dê Tiyarî çî d'kafirin,
Ma Tiyarî çî d'kafirin,
Ma wextê aşîtê digrin,
Ma jor da di kelê difikirin,
Dê wexte dê mêra girin,
Ma Mîroy lawê Bedkarî,
Ma Mîroy lawê Bedkarî,
Dê wa digot Xalidê Bedkarî,
Digel Nûrî begê Hekarî,
Derbas be li pêla Nizarî,
Here nik qewmê kufarî
Here nik qewmê kufarî
Tu sulhê bîne û êkcarî
Dê were bo Xalidê Bedkarî,
Ma digel Nûrî begê Hekarî,
Derbas bû li pêla Nizarî,
Hatibû nik qewmê kufarî,
Dê sulhê keyn û êkcarî,
We'm sulhê nakeyn û çî carî,
Dê qeşe û dîşoşe başe,
Sûn (sûnd) xarî bi Incîla reş e,
We'm dê mîr keyne keleş e,

Dê Xalid begê ray lê kirî,
Ma şêrê sor ray lê kirî,
Ma qeşe yê di qesrê kirî,
Mayê... vekirî,
Di neqeba dêrê helbirî,
Dê aşîtê xweş aşîtê,
Ma çend mêrgin hindkanî tê,
Ma..... ya tenge,
"..... naçîtê",
Dê aşîtê bi xir e û ber e,
Bo çirfîna bazin zer e,
Dê Zeynel beg ser esker e,
Dê Zeynel beg ser hewal e (hevale),
Ma Zeynel beg ser hewal e,
Wî agir berda qewal e,
Dê wavka (avka) mezin xwe xar e,
Dê cabê bigeyne Bedirxan,
Ew xudanê qewmêd giran,
Dê Bedirxanê reş rabe,
Ma meyter vana dada bû,
Dê toza li Elemînê rabû,
Ma eskerê minê bidome,
Dê li Dêrgulê cema bûne,
Dê li Dêrgulê cema bûne,
Ma xişya bûn Kurd û Rom e,
Dê yê li Dêrgulê hatine xar,
Ma bi qelem û be hejmar,
Ma sed û bîst û çar hezar,
Dê yê li Dêrgulê birêket in,
Ma Şernexê bi berê ket in,
Ma Cizîrî eşîret in,
Ma Tiyarî di bêferset in,
Dê hella û hella û Bedirxan,
Ew xudanê qewmêd giran,
Ma dê li kuyrê danin dîwan,
Ma dê li Dêrgulê birêketin,
Ma Elemînê bi serketin,
Ma Şernexê bi berê ketin,
Ma Cizîrî eşîretin,
Ma Tiyarî di bêfersetin,
Ma cabê bigehîne Çeliya,
Ma dalê bigrin geliya,
Xilas neken Tiyarîya,
Dê ew Çelî ne d'busirmanin,

Ew xaîn bûn digel Bedirxan,
Wa rê dabû Tiyarîyan,
Dê hella û hella û Bedirxan,
Ew xudanê qewmêd giran,
Ma dê li kuyrê danin dîwan,
Dê li Elemînê birêketin,
Ma sera û kotira serketin,
Ma Şernexê bi berê ketin,
Dê Cizîrî eşîretin,
Ma Tiyarî di bêfersetin,
Dê sera û kotira ya bi gûnî,
Ma Tiyarî ye û kes nabînî,
Dê kuryê di babê diwerînî,
Dê şer kete Sêf Seyda,
Dê vekeyn tola Seyda,
Dê ev kafirêd li nik çelek,
Wan Seyd birbûne helek,
Wan Seyid yêd sinsila pak,
Wa Seyid yêd sinsila pak,
Ma sera û kotira birêketin,
Ma Kevrê Dêrê biserketin,
Dê Şernexê biberketin,
Ma Cizîrî eşîretin,
Ma Tiyarî di bêfersetin,
Ma melîk Simaîl çi kir,
Wî berk û derman hazir kir,
Dê gelek esker telk bir,
Ma gelek esker telk bir,

Dê Kevrê dêrê ya bi gûnî,
Ma Tiyarî ye û kes nabînî,
Dê kur yê di babê diwerînî,
Ma Kevrê dêrê bi tîsî,
Ma çirfe çirfe û birîsî,
Ma kur li babê napirsî,
Dê Kevrê dêrê bi rîvas e,
Eskerê besin heyat e,
Xilas neken dîn xilas e,

*Dibêjin li Kevirê dêrê asê bûn, pîrejinekî heft kur hebûn,
xwe îxtiyar kirin û dane bi dîv ve heta li sorê derketîn.*

(*): Têkiliya vê parçeyê bi **Bedirxaniyan** re heye.

Zirav

Zirav, Zirav, Zirav lê lê,
Hay keçkokê ziravê,

Ev zirava bi ta û derzî,
Hay keçkokê ziravê.

Te d'go ax, mi d'go xwezî,
Hay keçkokê ziravê. Konê bav' te mezin e,
Hay keçkokê ziravê.

Ez geryame li serî û b' nê,
Hay keçkokê ziravê.

Stûna navê j' hesinê,
Hay keçkokê ziravê.

Hûn bimînin di bextewarî û xweşiyê da, ta derketina birrekî dî ji (Strana Kurdî), bi alîkariya Xwedayê gewreban.

Bonn, 13.04.1999 z

CANKURD